


Şêx Mihemed Can

LEYL Û MECNÛN



PENCİNAR

Wesanxaneya Çanda Kurdi
Stockholm 1992



Bi sadî, azadî û serkeftin
23.04.1993
Zeynel

Şêx Mihemed Can

LEYL

Ü
MECNÛN

LIV.KL.2470
30/11/2017

922 CAN LEY

Wergêr ji Tipêñ Erebî:
Zeynelabidîn Zinar

Wêneyê Berga Pêşî: Kermal

PENCİNAR
Weşanxaneya Çanda Kurdî
Stockholm 1992

Pencînar
Kurdiska Kulturförlaget
Weşanxaneya Çanda Kurdî
Box 3088, 161 03 BRÖMMA/Stockholm
Sweden

Leyl û Mecnûn 1992 Stockholm
ISBN 91 630 1486 6



Şêx Mihemed Can (1858-1909)

Şex mihemmed can qendirin fan bayisi, a
jus muchammedcan beşik hawza dervishin (şey) qoladı
mecidiye Roberts şerife hemandır. Şerife hanımın mola
kawana şirazlı. Mecdi, 12.12.1906 (13.12.1906)
Şerif, a məzvîliyən Nizâmîn Əfzalıyan
Şeikhliyən, hərbiyyən şəhərə yuxarıda Şəhərən
əməkçi, bəzək təməzi. Şerife hanımın mola
kawana hərbiyyən Nizâmîn Əfzalıyan, 12.12.1906
Şerif, mələk 25.12.1906 (1.1.1907) Məlik Mərdək Aşiqi,
Mərdək Aşiqi. 12.12.1906 (1.1.1907) Məlik Mərdək Aşiqi,
Şerif, 12.12.1906 (1.1.1907) Məlik Mərdək Aşiqi,
Şerif, 12.12.1906 (1.1.1907) Məlik Mərdək Aşiqi,

Qopiyek ji kurtenameya ku behsa jinenigariya
nivískarê hêja Şêx Mihemed Can dike.

PÊŞGOTIN

Hin rastî hene nayêtin îmkarkirin, hin şaşî hene nayêtin rastkirin û hin gotin jî hene ku nayêtin jibîkîrin. Erê ev jî rast e ku *mal bi xwedî be ava ye û sifra xwarinê ger bi destêne kebaniyan be sên e*. Ha wisan e zimanê kurdî jî bi lawên fedakar ên dilovan her ku diçe roj ji rojê zêdetir şenîtiya xwe radixêle pêşberî mirovatiyê û jê şax û perên nûjen diafîrin; ji taristana gemar derdikeve û dibe wek gulîstana îremê.

Belam çi dema ku asîman dibe sayî û ewrên reş û tarî difirrikin bêbextiya xwe ji kurdan re kêm dikin, pêre pêre ziman û folklora kurdî jî geş dibin û ji qalikên qeşemgirtî derdikevin ger miyanê, şax û tîrhîn kevnare yên ku ev 67 sal in hatibûne kurisandin jî katine nûjen didin, bejna xwe dirêj dikin û dixwazin ku xwe bigehînin wê sawiya ku sezayêne devera lê ne.

Yek ji wan berhemên ku berî niha bi sed û heşt salan hatibû nivîsandin û ji 1925-an ve ye jî ku di qul û qewêran de veşartî mabû, herweha ku hawîdorê wê bi diranêni mişkan tev hatiye kurisandin û piraniya rûpelên wê ku ji nêmê kufikî bûne; gelek rêzên wê jî heşifine, ha ev pirtûka folklorî ya bi navê *Leyl û Mecnûn* e.

Ev pirtûka hêja ji aliyê Şêx Mihemed Can ve hatiye nivîsandin. Dema destpêka nivîsandina pirtûkê ne diyar e. Lê çewa di malikeke li dawiya wê de ku bi tarîxa koçê hatiye nivîsandin, di "Hezar û sêsed û du" duyan de kuta bûye. Îcar ev tarîx li hemberê ya Mîladî dike 1884. Ji bili vê, çend rûpel medhiyeyeke Şêx M. Can jî heye, ku li ser *Rewdneîma* kekê xwe Şêx Evdirehmanê Axtepî nivîsibû.

Li gor beyana nameyeke ji malbata Axtepiyan ku di 02 10 1992-an de gîhabû min; Şêx Mihemed Can di 13-ê meha Şe'bana 1274-ên (1858-59'ê Mîladi) Koçê de li Axtepeya girêdayê bi qeza Çinarê ve (Diyarbekir) hatiye dinê û di heştê Sibata 1325-ên Romî (21'ê Adara 1909-10) de jî çûye dilova-

niya xwe.(*)

Mihemed Can kurê Şêx Hesenê Nûranî ye, navê diya wî Şerîfe xanima keça mele Hesen e û birayê bindest ê Şêv Evdirehmanê Axtepî ye.

Ji xeynî Şêx Evdirehmanê Axtepî û Şêx M. Can, du birayên wan yên din jî hebûne. Yek Şêx M. Sirac e û yê din Şêx M. Nûr e. Şêx M. Can jî sê kurên xwe hebûne; Mihemed Hesib, Mihemed Mûnîr û Mihemed Behcet.

M. Can xwendina xwe ya destpêkê li cem bavê xwe kiriye. Piştre di Medreseye bavê xwe ya li Axtepeyê de li cem Mele Selîm û Mele Mihemed Emîn xwendina *Nehw, Tefsîrê, Hedîs, Mentiq* xwendîye. Wî destûrnameya xwendinê ji Dersdarê menşûr ê Kurdistanê Mele Mihemedê Kurmuşluyê wergirtiye. Pişti wergirtina destûrnameya xwendinê M. Can çûye Şamê û ji Mewlana Xalidê kurdî (**) yan ji hin xelifeyên wî xelifetiya Rêçika Nexşebendî jî wergirtiye. Piştre Şêx M. Can şunde ve geriyaye gundê xwe Axtape û li şûna kekê xwe Şêx Evdirehman di Medresê de desdarî kiriye ta ku çavêن xwe ji dinya ruhnik girtine.

Di Hezîrana 1992-an de fotoqopiyê pirtûka *Leyl û Mecnûn* digel wêneyê Şêx M. Can û yê kekê wî Şêx Evdirehman, bi alîkariya hin biraderan gihane min. Ev nusxa di destêن min de, Şêx Eskeriye kurê Şêx Evdirehmanê Axtepî ew di 1924-an de ji nû ve dîsa bi tîpêن erebî nivîsiye û di Temûza 1934-an de ji kuta kiriye. Herçiqasî di wê navê re deh sal bihurîne û demeke dirêj e jî, lê bila nête jibîrkirin ku rûxandina Serhildana Kurd a bi serokatiya Şêx Seîd tîna xwe li her tiştî kiribû. Pirtûk ta niha jî nehatîye çapkîrin.

Ev destnivisa Şêx M. Can 148 rûpel e, digel beşâ destpêk û ya dawî tê de 21 sernav û 1882 beyt hene. Helbestên wê hemû xwesxwîn û rewan in; bi deh kiteyan dikişin û qafiyeya her du rezên malikan jî yek e. Min jê re ferhengokek jî bi alîkariya mamoste Ferhad Şakelfî saz kiriye û digel teksta bi tîpên erebî da çapkîrin.

Em ê hin agahdarî di derheqê serpêhatiya *Leyl û Mecnûn* de ji pirtûka Doktor Marûf Xeznedar(rûpel: 164-183) ya bi navê

* Di navbera tarîxa Romî û ya Mîladî de 584 sal hene û destpêka mehîn Romî 13 rojan piştî yên Zayînê ye.

** Mewlana Xalidê Kurdî di 1776-79'an de hatîye dinê û di 1828'an de jî wefat kiriye.



Mêjûyî Edebi Kurdi jêderk bikin û li jêr binivîsin:

- Qeysê kurê Mulhiyê kurê Muzahimê Amîri di 68-ê hicrî 688-ê mîladî de miriye. Û Leyla ji keça Se'd e.

Helbestvanê gewre yê Rojhilatê Nîzamî Genceyî li sedsala duwanzdeyan de yekemîn e ku romanekê helbestên klasik ya *mesnewî* û bi kêşa *hezec*, bi zimanê farisi li ser Leyl û Mecnûn nivîsiye.

Doktor Marûf Xeznedar gotiye, ku: Hemû şairên rojhilatê ji Nîzamî Gewre îlham girtine û serpêhatiya Leyl û Mecnûn nivîsiye.

M. Salih Dilan gotiye: Yûsifê kurê Zeki Mueyyed ê bavê Nîzamî Genceyî Kurd bû. Ji Îraqê koçî bajarê Qûmê kiriye. Diya Nîzamî ji mala Şedadê Kurd ê fermandarê navça Gencê ye.

Mele Mihemed Qûlî li ser Leyl û Mecnûn di 1140-ê hicrî, 1732-ê mîladî de nivîsiye.

Ehmed Şewqiyê Kurd ê helbestvanê Ereb li ser Leyl û Mecnûn (1868-1932) şanogeriyeke şî'rê nivîsiye. Destniviseke din Mele Weledxan di 1885-an de nivîsiye. Destnivisa Mîrza Şerîf ji aliye Mele Rezayî ve di 1894-an de hatiye nivisanddin.

Destniviseke Harisê Bidlisî heye, ku di 1758-an de serpêhatiya Leyl û Mecrûn nivîsiye. Ev nusxe 740 beyt û 24 beş e. Bi kêşa *hezer* û bi şîweyê *mesnewî* ye. Rojhilatnasa Soyet Rûdenkoyê ev nusxe wergerandiye rûsi û li serê şrove kiriye.

Mele Mehmûdê Bazîdî di 1808-an de wê Leyl û Mecnûna Fizûlî ku ji farisi wergerandibû tirkî, ji tirkî wergerandiye kurdî û bi awayê pexşan nivîsiye.

Nusxeyeka Leyl û Mecnûn bi xetê Mîrza Qûlî Hersinî jî, bi tarixa 1902 heye.

Di 1942-an de Mele Ferc Salih Şebkî beşck ji Leyl û Mecnûna Nîzamî ji farisi wergerandiye kurmanciya jêrîn. Elî Kemal jî di 1950 de teksta Nîzamî wergerandiye kurmanciya jêrîn.

Helbestvanê Kurd Ebdulcebar Axayî Kanî, wê nusxa ku wergerandibûne tirkî, wergerandiye kurdî û sê caran li çaaixana Kurdistan hatiye çapkîrin. Çapa duyemîn di 1969-an de derçûye.

Nexwe eve eşkere bû ku serpêhatiya Leyl û Mecnûn pêşî bi zaravayê goranî, piştre bi yê kurmancî û hêj bi yê soranî hatiye nivisandin. İcar li gorî van agahdariyêni li jor, destnivisa herî dirêj li ser Leyl û Mecnûn, ev pirtûka Şêx M. Can e.

Şêx M. Can bi helbestkî serpêhatiya evîna Leyl û Mecnûn bi zaravayê kurmancî nivîsiye û ji me re diyarı hiştîye. Em ji

bo vê diyariya wî pir spas dikin û heta bi hetayê jî xwe jê re deyndar dihesibînin.

Şêx Mihemed Can di destpêka pirtûka xwe de sedemê nivîsandina bi zimanê kurdi weha beyan kiriye:

*Kurmancî qesaïdê di mewzûn
Behsê bikin ew jî halê Mecnûn.*

*Turkî hene, nîne kurdewarî
Kurdî wekî kenzeke veşarî*

*Qet nîne kesek ji xelqê Ekrad
Leylasîfet ew bî ah û feryad?*

Şêx M. Can gili û gazinên xwe ji felekê pir kirine, ku Kurd wisan li holê bêxwedî mane û ku kesekî li wan xweditî bike jî nîne. Herwisa dema wî ev çend malikên li jêr nivîsîne, guh li pendêن mamosteyê nemir Ehmedê Xanî kiriye û dest avêtiye xameya rengîn, pê dilsoziya xwe anîye zimên:

*Peyda bikira ger me emîrek
Sahibhuner û xwedanê şîrek*

*Ev Turk û Ereb, Tetar û Faris
Carek bibûna li ber me naqis*

*Her sairekî zebanê Kurdan
Qet nayê jî halê wan xeberdan*

*Emma ku xwedan ji bo me nîne
Nêv Rom û Ereb ne ademî ne?!*

*Her mîrê di wan de ejdiya ye
Nêv Rom û Ereb wekî çiya ye*

*Ger yek jî bit û deh ji Etrak
Hemyan bikitin bi subhetê xak*

*Ekradîsîfet sexî tu nin qet
Wan qehwe diçin bi subhetê set*

Nivîskar herçiqasî xwe sezayê nivîskariyê nedîtiye jî, lê ew xîreta welatperwerî ku lê hebû destûra sekn û betaliyê nedaye wî ku ew xwe bêdeng bihêle. Û bêdengiya xwe disa bi van çend malikên li jêr şikandiye, gewhera kana xwe derxistiye bazara xerîdaran û pêşkêse kirroxan kiriye:

*Hasil ketime te'essuba wan
Xiret me kışandî bi qelb û can*

*Neku me heye tu qabiliyet
Belkî me heye hink jî xîret*

*Behsê bikin em jî halê Mecnûn
Leylê bibe pê dil û ciger xwûn*

*Elfazê di kurdî pur gérîn in
Meqbûl in û wek durrê semîn in*

Li gorî vê pirtûkê bikurtî serpêhatiya Leyl û Mecnûn weha çêbûye:

Li Yemenê êleke bi navê *Benû Amir* hebû. Ew êl, bi mirovatî û camêrtî menşûr bûbû. Kurek ji serokê êlê Milûhiyê kurê Muzahim re çêdibe, navê wî datînin *Qeys*. Dema lawik dibe şes- heft salî, bavê wî ew dixe dibistanê.

Qevs di dibistanê de bi Leylaya keça Se'dê şêxê êlekê re dibe hevalders. Herdu hev dihebînin û dil dikevin êkdu. Piştre evîna wan li nav xelkê belav dibe, heta ku bavê Leylê jî seh dike û êdî nahêle keça wî herc dibistanê. Piştre *Qeys* jî dest ji dibistanê berdide û ji ber agirê evîna Leylê bi çolan dikeve, yekcara jî li hawidorê êla bavê wê diçe û tê, bi umîda belkî ku wê bibîne. Bi wê yekê *Qeys* di nav xelkê de bi *dînîtî* tê navdarkirin û jê re dibêjin *mecnûn*.

Bavê Mecnûn diçe çolê li kurê xwe digere. Dema wî dibîne ew tîne malê û nahêle êdî derkeve der. Piştre diçe Leylê jî kurê xwe re dixwaze. Lê bavê Leylê dibeje *kurê te dîn e, ez keça xwe nadîm wî*. Mecnûn radibe dîsa bi çolan dikeve û Leylê jî ji evîna wî re derdmend dibe.

Li wê herêmê zilamekî pir dewlemend bi navê *İbnu Selam* hebû. Dema ew salixê delaliya Leylê hildide, diçe nextekî pir zêde dide bavê Leylê û wê ji xwe re dixwaze.

Di wê navê re rojek ji rojan *Newfelê* ku mezinê êleke herî mezin bû diçe nêçîrê. Ew li çolê Mecnûn dibîne. Çaxê ku sedemê *dînbûna wî* ji ber evîna Leylê fam dike, wî bi xwe re dibe malê. Piştre ew leşkerê xwe hazır dike û diçe şerî bavê Leylê, da keçikê bi zor jê bistîne û bide Mecnûn. Lê di dema ser de Mecnûn ji bo xatirê ku dilê Leylê nemîne, ji leşkerê bavê Leylê re dua dike. Ewçax Xwedê dua wî dipejirîne, Newfel dişike û leşkerên wî hemû direvin.

Careke din Newfel leşkerekî hêjbihêzîr hazir dike û dişîne ser bavê Leylê. Lê ev car Mecnûd nîfir li bavê Leylê dike û Newfel zora wî dibe. Çaxê Newfel dest davêje milê Leylê ku

bibe, bavê wê dibêje: *Ma tu yê qîza min çewa bidî mirovekî dîn?* Newfel bi wê gotinê tête girêdan û dest ji Leylê berdide, leşkerê xwe şûnde vedikişîne û diçe mala xwe.

Dema leşkerê Newfeli çûye ser bavê Leylê, kêfa Leylê jî pir hatiye û gelekî dilxweş û şadan bûye. Lê gava bavê wê Nefselî daye bawerkirin ku keçeye bi aqil ne babeta yekî dîn e, êdî wê xwe bi temamî wenda kiriye, ketiye şûfê dînan û mîna Mecnûn lê hatiye.

Îbnu Selam daweta xwe lidar dixe û govendgêriyên pirtexlit ji nav ereban dicivîne. Dawetvanî diçin destêن Leylê hine dikin û wê diguhêzin. Evarê dema Îbnu Selam diçe mehfela Laylê, Leylê dibêje wî: *Ez dilketiya Qeys im, bavê min ez bi zor dame te û navêm ku tu têkilê min bibî.*

Piştî wê gotinê, Îbnu Selam hîç têkilî Leylê nabe, lê pir xemgîn dibe, nexwes dikeve û çend roj şûnde jî dimre. Tu nabêjî, dema Mecnûn dibihibize ku Leylê mîr kiriye, bi Zeyd re nameyek bo wê dişîne û wê bi xayintiya di evînê de tawanbar dike. Lê belê herçiqasî Laylayê bersîva wî dide û dîsa jî dirustiya xwe jê re eşkera dike, lê Mecnûn jê bawer nake?..

Bavê Mecnûn radibe dîsanê diçe li kurê xwe digere, da wî bibîne û bibe malê. Dema ew kurê xwe dibîne, dike nake Mecnûn pê re naçe. Piştre Mecnûn êdî xwe dide jiyanekê çolane û bi koviyen re dibe hemrah. Li çolê ew dest bi nivisandina hel-bestan dike. Yekcaran jî diçe nik hozanên bi navuden û di ilmê evînê de bi wan re niqaş û dehkere dike. Bi demekurtekê şûnde jî bavê Mecnûn jî derdê wî seri dide haziran û dimre.

Piştî mirina Îbnu Selam, Leylê bi qîzantî radibe diçe mala bavê xwe û xwe dîsa ji bo gihadina Mecnûn hazir dike. Lê dema ew dibihibize ku Mecnûn jê dilsar bûye û evîna xwe jê vekişandiye, nexwes dikeve û radibe diçe li çolan digere heta ku wî dibîne. Ew çax Mecnûn Leylê nanase. Leylê xwe pê dide nas-kirin, îcar Mecnûn têkil nabe û xwe jê dûr dike, wê bi xayintiya bi xwe re tawanbar dike. Erê her çiqasî Leylê mesela xwe û Îbnu Selam dibêje jî ku hîç ew têkilî wê nebûye, Mecnûn jê bawer nake.

Leylê bixemsarı vedigere mala xwe û êşeke bêderman lê peyda dibe. Ew nexweşin wisa lê didomîne heta ku ji derdê Mecnûn dimre.

Çaxê Mecnûn dibihibize ku Leyla ji derdê evîna wî miriye, gelekî li ber dikeve û ji dîtina xwe ya berê poşman dibe, hema radibe diçe ser gora wê. Li wir ew rûdine û digrî, digrî û bi rojan, bi heftiyan dimîne, êşa evînê xwe lê teze dike û li ser gora Leylê dimre. İcar wî di gora Leylê de binax dîkin. 17 07 1992

Naverok

Pêşgotin	7
Bîsmîlahîrrehmanîrrehîm	13
Sebebê Telîfê Kîtab	24
Benda Ewil Di Bûna Mecnûn De	30
Benda Diduya Di Beyana Çûna Leyl û Mecnûn Mektebê De	34
Benda Sisiya Di Beyana Xwestina Leylê De	45
Benda Çara Birina Mecnûn Ke'bê	53
Benda Pêncâ Di Beyana Halê Leylê De	62
Benda Şeşa Di Beyana Çûna Îbnu Selam Seydê	67
Benda Hefta Beyana Çûna Newfel Seydê û Dîna wî Mecnûn	72
Benda Heştâ Şîkayeta Leylê Ji Felekê	85
Benda Neha Di Beyana Daweta Leylê û Îbnu Selam De	98
Benda Deha Çûna Zeyd Nik Mecnûn	106
Benda Yazda Çûna Bavê Mecnûn Cem wî	114
Benda Duwazda Di Mirina Bavê Mecnûn De	124
Benda Sêzda Di Mirina Îbnu Selan De	138
Benda Çarda Di Beyana Ehwalê Kemala Mecnûn De	159
Benda Pazda Di Mirina Leylê De	161
Benda Şazda Bihîstina Mecnûn Mirina Leylê û Mirina Wî	169
Benda Hivda Dîna Zeyd Leyl û Mecnûn Di Xew De	179
Saqî, Name û Xetmê Kîtab	182
Ferhengok	187

KÎTABÊ LEYLA û MECNÛN

Ruba î (Çarîne)

Dunya wekî leyлан û serab e, nezerê ke
Beyhûde bes e, hinde cefa û kederê ke
Huba vê cîhanê gelekî jê hezerê ke
Mestane û mestûrî be, tê jî seferê ke

1924

M. Eskerî
(îmza)

Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm

Bi îsmê te Xwedayê heyy ê ekber
Ewel bikim îbtîdayê defter

Bê îsmê te îbtîdayî nabe
Bê namê te name nasewab e

Ev îsm e ku alema wucûdê
Pir işqê kirî bi vê şuhûdê

Navê te ku işqî lê nîqab e
Ew navê li Lewhê ser rîqab e

Işqê ji wî navî Erşê d`îsand
Ewel Qelemê li Lewh nivîsand

Îsmê te ye işqê daye kewneyn
Navê te ye ulfê xiste mabeyn

Hîna ku ci name û kîtab in
Bê îsmê te şerh û bestî nabin

Min jî bi vî îsmî îbtîda kir
Heqê serê name pê eda kir

Ey qadir û wey kerîm û rehman!
Hem raziq û bê şerîk û deyyan!

Ey xaliqê Lewh û Kursî û Têrş
Wey hafizê neh felek heta Fers

Ey baniyê taqê lacîwerdî
Wey munşiyê afîtabê zerdî

Ey rafî 'ê qubeyê kebûdî
Wey dafi 'ê çesmê her hesûdî

Ey qadirê bê çira û çûnî
Ageh ji derûnî û birûnî

Te çerxê sema bulund û rakir
Ev erdê feqîrî pest û dakir

Tu müsi 'ê gunbedê supehr î
Tu nafi 'ê nûrê mah û mehrî

Tu xaliqê raziq î, qedîr î
Bê misl û heval û bê nezîr î

Tu sani 'ê qadir î, hekîm î
Tu hadiyê barî yê kerîm î

Rehman û rehîm û hem xefûr î
Wahid û ehed î, ji neqsê dûr î

Ey xalîqê muşterî û keywan
Bestî te li mah û mehrê seywan

Zanim te wucûdî kirye alem
Tewsîrî te kir Hêwa û Adem

Adem te ji cennetê deranî
Hêwa te li cem wî anî danî

Feleka ku te çêkir û te xas kir
Ew jî ku te Nûhî pê xelas kir

Mûsa te gihande Tûrîseyna
Eyyûb te rihand ji eyb û şeyna

Yûsuf te li Misrê pur ezîz kir
Işqa xwe bi wî te xweş lezîz kir

Mehbûbî te çêkirin dilaram
Aşiq te kirin esîr û nakam

Hinkan tu dikî feqîr û aşiq
Peyweste bi narê işqê lahiq

Hin hûrisîfet bi şîwe û naz
Mumtazî dikî bi husnê mumtaz

Hinkan tu dikî ezîz û sultan
Hinkan tu riha dikî ji tofan

Hinkan tu dikî bi işqê razî
Hinkan tu dikî ji işqê tazî

Hinkan tu dikî zelîl û mehzûn
Hinkan tu dikî xerîb û mecnûn

Evrêng e tu hikmetê digêrrî
Mewcûdê li jor û hem li jêr î

Gerdûn û supehrê bê medara
Herweh digerînî aşîkara

Ger padîşeh in, we ger emîr in
Der bendê qezayê te esîr in

Şemsa felekê te kirye pir nûr
Pê kir te ji zulmetê cîhan dûr

Gerdûn te gerand û dewrê danî
Neqqaşî tu yî ji bo sema danî

Ev sun'ê te sani'ê qedîr e
Ev neqşê neqaşekî xebîr e

Tu rezaq, û rizqê mûr û fîlî
Fewarekunê Ferat û Nil î

Ev bad û we ab û agir û xak
Ev fehm û kiyaset û hem idrak

Bîl cumle te çêkirin bi qudret
Da wan te burûdet û heraret

Esman te bi neqş û hem nîgar kir
Dunya li me pê te germ û sar kir

Mewcûd heme bende û tu şah î
Alem heme ebd, tu padîşah î

Fail tu yî qadirê mutleq
Hem hâkimê alî yî tu elheq



Ezman û zemîn û erd û esman
Fealî tu yî di wan de her an

Bê emrê te nagerrin qe carek
Ehsen ji te ra û sed tebarek

Esmanê bulend te pir melek kir
Erd sabit û işqî tê gelek kir

Aşiq te kirin hezîn û naçar
Dil çîkerin û te kir birîndar

Mehbûb te kirin letîf û gulreng
Aşiq te kîfî li wan cîhan teng

Maşûqî kirin bi lewn û dîlber
Hin sor û sipî û hin jî esmer

Tu padîşeh î û ma geda im
Bîl cumle bi emrê mane qaim

Esma, te ji Ademî re gotin
Mecnûn û Memê bi wan te sotin

Ey faliqê subh û xasiqê şeb
Alem heme tifl û her tu yê reb

Mehbûb û hebîb û hub û aşiq
Anîne te bi hev kirin muwafiq

Ger aşiq in û we ger hebîb in
Ew gerdu ji tali' xerîb in

Der dehrê ji wan re nîne rahet
Her derd e, ji wan re êş e adet

Agir te li wan bi pêt û dûd kir
Ev herdê di wan de te wucûd kir

Amir cu tu yî bi "kaf" û hem "nûn"
Nîne ji te ra çira û hem çûn

Bîllah nizane kes beyan ke
Xeyrî te niye kesek eyan ke

Derdê ku te daye nav hinavan
Xwûnabê dikî pê herdu çavan

Ey kaşê ji agirê wî derdî
Surxî me li rû bibûya zerdî

Raha ku bi xef didî uşaqan
Rûzerdî dibin ji ber meraqan

Saqî bide min ji wê şerabê
Rû zer bikin em çu afîtabê

Meşhûrî bibin di nav-i 'amê
Em jî bikevin wê qeyd û damê

Eş'suhretu afetun me zanî *
Ya Reb tu fida bikî vî canî

Heta ku tu can nekî rehîne
Çavê te qe nabe dûrebîn e **

Ewel qedema di vê mecalê
Serbaxîte ne li ber cemalê

* *Eş'suhretu afetun*: Mensûrtî afat e.

** Amaca nivîskar ji malikê ev e: Heta ku mirov
zehmet nede xwe, mirov nabe zana û dûrbîn.

Aşiq nebe mehwê husnê saqî
Çawa dibilitin bi işqê baqî?

Ez muntezir im kûyî cemalê
Lê seyrî bikim bi yek xeyalê

Qadir tu yî, hadî û 'elîm î
Der sun'ê xebîr û pur helîm î

Heyy û ebed î, tu dê beqa bî
Ev kewn û wucûd ê dê fena bî

Her hakim î emrê "kaf" û "nûn"î
Agah î ji razê her derûnî

*Lem yûled û lem yelîd ji bo te **
Walid, mirin û weled ji bo me

Em dê xwe fena û hem 'edem bin
Gerçî ku li ber derê İrem bin

Çendan ku tu 'Adê pur şedîd bî
Ya dêwê pelîd ê pir 'enîd bî

Labud tu diçî di nav mezarê
Her çendî bikî tu ah û zarî

Çêkirne Xweda emîr û sultan
Hukmê wî ev e di dewrê esman

Dewra felekê wuha dike çerx
Rezaq e, li rizqê daniye nerx

* Keysetekî Xwedêye, ku ne diwelidîne û ne jî hatiye
welidandin.

Hin padîşeh in, hinek zelîl in
Hin müşrik in û hinek xelîl in

Hin mumin in û hinek jî kufar
Hin bê guneh û hinek gunehkar

Hin mîr û wezîr û hin qelender
Hin dîlber û nazenîn û esmer

Hin xâb û perî û dîlrûba ne
Hin aşiq û jar û bê newa ne

Hin perdeder in, hinek mestûr
Hin wasil û hin be ïd û meqhûr

Hin sorgul in û hinek jî bulbul
Hin bê xem in û hinek jî dîlkul

Hin baz û îqab û hin jî şahîn
Hin kebk û tezerwê pur bi ahîn

Hin durr û sedef, hinek jî murcan
Hin Leyl û Şêrîn in, hinek jî murrcan *

Hinkan dike ew emîr û Tatar
Hinkan jî dike esîr û dildar

Hin daye ewan gunah û 'isyan
Da herqî bike di narê nisyân

Hin dayiye wan terîqê mehkem
Peyrew kirine bi fexrê 'alem

* *Murrcan*, ji "mirr" û "can" hatiye, bi mana
xwîntahl e.

Sed şukur te çêkirim musulman
Bexşîne bi min te dîn û îman

Çêkirme ji ummeta Muhemmed
Tehqîqî şeffî' e bo me Ehmed *

Heq mumin im ez bi qelb û can
Tesdîqê dikim Resûlê Rehman

Edda guneha tu nîne şaha
Destê min û dawê alê Taha **

Ez ummetê xeyrê murselîn im
Hem peyrewê padîşahê dîn im

Hêvî me ew e ku ummeta wî
Cumle bixî ber şefa'eta wî

Ez zêde gunahikar û pîs im
Nîne me 'emel ku pir xebîs im

Hasil minê pir gunah û naçar
Hêvî bidî xatirê Çihar Yar ***

Hindî ku Xwedê cîhan kir abad
Danîne bi qudret esl û bunyad

Çêkirne çiya û behr û ehcar
Esmar û wereq, nebat û eşcar

* *Ehmed*, navekî Mihemed Pêxember e

** *Taha*, xeysetnavekî Mihemed Pêxember e.

*** *Çihar Yar*: Her çar yarê Pêxember ku Ebu Bekir,
Umer, Osman û Eli ne.

Bîl cumle bi zereyê di hûr bin
Heta ku ji fikrê xelqê dûr bin

Edda ku di 'ilmê Barî mewcûd
Ew çendî selat li şahê Mehmûd

Teslîm û tehiyetên mûbarek
Ser al û sehabê wî bi carek

Edda hesenatê imamê Siddîq
Ewel ewî kir bi dinê tesdîq

Ewçendî selat digel selaman
Ser Ehmed û al û hem sehaban

Niqdadê nifûsê xas û 'amê
Ez rûzî ezel heta qiyamê

Her rojê dused hezarî milyon
Teslîm bi şîbhê durrê meknûn

Ez Xalîqê cumle mumkînatan
Teşbîhê meter li ser nebatan

Daîm birijin li ser te w alî
Heta ku heşir bibîte xalî

Ser şahê xwedan Boraq û Mîrac
Hem al û weled, sehab û ezwac

Ez hêvî dikim ku bo feqîrî
Der heşrê bikî tu destegîrî

Vî 'asiyê pir xeta û nisyan
Peyrew bikî wî bi ehlê îman

Lewra ku ji ummeta te me ez
Çehvnêrê li himmeta te me ez

Min bernedî ey şefî 'ê 'ussat
Der heşrê nekî xwedanqibahat

Ya Reb tu Xakiyê gunehkar *
Mehrûm nekî ji şahê Muxtar.

* *Xakî*, nasnavê nivîskar e ku ji xwe re di dawiya hel-bestên xwe de anije.

SEBEBÊ TELÎFÎ KÎTAB

Nezzamê cîhan, xwedanê rehmet
Gava weh ku xelqî kir ji qudret

Eflakê bi terzekî gerandin
Mexlûqî di sun 'ê heyirandin

Tezyînî bi kewkeb bû qemer kir
Nûra wî di şemsê de eser kir

Hindek ji kewakib û sitêran
Her yek wî bi terzekê digêrran *

Da eql û huner ji boyî însan
Pê ferqî bikin xeta û 'isyan

Evreng e dibêjî Cam Muhemed
Xakiyê ku hicrî lê bûye sed

* *Digêrran:* Daye gerrandin.

Pir derdê ji hicrê nazadarî
Mehrûmê ji suhbeta kubarî

Leşker ji xeman li min cema bûn
Lew xwarin û xwabî min nemabûn

Axir me nedî wîsalê mehbûb
Hasil qe nebû ji bo me metlûb

Ez hesretê yarê bûm cîgerxwûn
Reng şubhetê Leyl û mislê Mecnûn

Daîm bi fixan û dad û feryad
Sed ah diçin ji qelbê naşad

Ruxzerd im û pir hezîn im
Karê me ji hesretê girîn im

Carek çi dibû gelo hebîbî
Pirsek bikira li min xerîbî?

Yar ez kirime jibîr yekcar!
Lew bûme zeîf û zar û naçar

Bes qelb û cîger li min bike şeq
Zulfan tu veke bi şubhê beyreq

Carek were der ji paşê perdan
Min bêmededî bide xeberdan

Pirsek tu bike li aşiqê zar
Mesrûrî bike bi weslê dîdar

Hicranê ji bo te ez beyan kim
Derdê di dilê xwe ez eyan kim

Bêjim ji te ra zemanê borî
Herçî ku me dî ji halê dûrî

Guh de tu li ser sedayê aşiq
Vî aşiqê mubtela yê sadiq

Mecnûn bikim cunûn û şeyda
Leylayê ji bo ve bikme peyda

Kurmancî qesaïdê di mewzûn
Behsê bikin ew ji halê Mecnûn

Turkî hene, nîne kurdîwarî
Kurdî wekî kenzekî veşarî

Qet nîne kesek ji xelqê Ekrad
Leylasîfet ew bi ah û feryad?

Îşqê qe nekirne ew belakêş
Hicrê qe nekirne ew cîgerrêş?

Min dî hene, lêkî bê mecal in
Pir aqil û sahibkemal in

Sahibhuner û xwedanhewes bûn
Lê şubhetê teyrekî qefes bûn

Wan nîne müşîr û ne debîrek
Ne padîşehhek, ne wan wezîrek

Peyda bikira me ger emîrek
Sahibhuner û xwedanê şîrek

Ev Turk û Ereb, Tetar û Faris
Carek bibûna li ber me naqis

Her şairekî zebanê Kurdan
Qet nayê ji halê wan xeberdan

Her şî'r û qesîde dê bigota
Dunya serobin hemî bisota

Emma ku xwedan ji bo me nîne
Nêv Rom û Ereb ne ademî ne!

Lêkin hemî cumleten xeyûr in
Sahibkerem in, di bê qisûr in

Her mîrê di wan de ejdiya ye
Nêv Rom û Ereb wekî çiya ye

Ger yek ji me bit û deh ji Etrak
Hemyan bikitin bi şubhetê xak

Ewçendî sexaweta li erdan
Bîl cumle Xwedê didaye Kurdan

Ekradîsîfet sexî tu nin qet
Wan qehwe diçin bi şubhetê şet

Ne Ce'ferê Bermekî, ne Hatem
Qet nîne kesek ji neslê Adem

Tesbihê bi wan bi bezlê emwal
Der rahê Xweda di xeyrê e'mal

Hasil ketime te'essuba wan
Xîret me kişand bi qelb û ezman

Neku me heyen tu qabilîyet
Belkâ me heye hinek ji xîret

Îmdadê me xwest ji Rebbê Barî
Tenwîrî bikî vî qelbê tarî

Qiset bikim ez hewayê Leylê
Mecnûnî bike bi bal ve meylê

Behsê bikin em ji halê Mecnûn
Leylê bibe pê dil û cîger xwûn

Min xame hilanî serqelem kir
Xetê Qiseyê me pê reqem kir

Kurancî hinek kelam û eqwal
Gotin me ji bo minasibê hal

Elfazê di kurdî pir şêrîn in
Meqbûl in û wek durrê semîn in

Min hêvî heye ji ehlê ilmê
Ew lê binerin bi çeşmê hilmê

Herfan megirin, mebên *xerab e* *
Newbawe ye, pir bi min şebab e ?

Ez hêvî dikim ji ehlê îhsan
Herçî ku we dî xeta û nisyan

Te`wîlê bikin bi lutf û in`am
Teqbîhê mekin li nêvê e`wam

Min xeyrî evê kîtab û guftar
Qet çi nekirin bi nezm û eş`ar

* *Herfan megirin:* Rexne nekin.

Ya Rebî bi heqê Mustefa kî
Xakî tu bi işqê mubtela kî

Işqa xwe ji bo me ra nesîb kî
Qelb û cîgerê me pê kebîb kî

Hem işqê Hebêbî rûzî mehser
Bo vî nekesî bikî muyeser

Roja ku diçine ber hîsabê
Bavêjî yemînê min kîtabê

Hem babê min û we da û îxwan
Ehmed tu bikî şeffî ji bo wan

Hem cumle muminê di ummet
Der rojê qiyam li wan kî rehmet

Ya Reb tu Xakiyê gunehkar
Mehrûmî nekî ji şahê Muxtar.

BENDA EWIL DI BÛNA MECNÛN DE

Seh kir me ji rawiyanê adil
Ruwvatê xwedanê eqlê kamil

Gotin ku: Hebû zemanê sabiq
Êlek Ereba ji sun'ê Xaliq

Bîl cumle dîlawer û bi suhbet
Her yek bi mîsalê hûrê cennet

Îsmeş *Benû 'Amir* ew dibêjin
Malê xwe ji bo Xwedê dirêjin

Sahibkerem û xwedanê zad in
Ser cumle eşairan ziyad in

Lêkin hebû wan ji hakiman yek
Sahibhuner û zeka û zîrek

Pir malî hebû ziyade dewlet
Efradê Eşîrê hemî di xizmet

Yek rojî nemaye bê musafir
Îslam û Cuhûd û ters û kafir

Xîme bi mîsalê deştekê reş
Eqlê merivan dikir müşewweş

Daîm binê kon tijî bû însan
Xalî nedibû tu car ji mîhman

Mîr û umera, xwedanê tacan
Rengşubhetê qafilê hecacan

Rêwî û fuqare her tejî bû
Ni'met ji Xweda li ser rijî bû

Pêşkêş dikirin ji wan re daîm
Hesp û deve û pez û behâîm

Hesret wî di diî de qet nema bû
İlla ku Xweda weled nedabû

Wî malî ji bo Xweda telef bû
Her weqtê rica wî yek xelef bû

Daîm bi rica û ah û zarî
Hêvî dikir ez Xwedayê Barî:

*În'am bikî bo me yek puser tu
Tesiye bikî me ez keder tu.*

Hasil Xwedê da wî lawekî pak
Mehparesîfet, di çerxê eflak

Pir şukur kirin ji boyî Me 'bûd;
Îhsan li me kir Xwedayî mewcûd

Da me puserek bi şubhê bedrek
Çêkir ji me ra ji nû ve sebrek.

Bê hed deve û pez û cimalan
Kirne sedeqe wî terş û talan

Navê wî bi *Qeysî* kirin meşhûr
Ez hedê ziyade bûne mesrûr

Hifza wî kirin ji ba û tavê
Daîm di hemêzê dê û bavê

Reng şubhetê gogekê ji zer bû
Ser destê ewan wekî qemer bû

Sê salî temam bi vê hewayê
Geh bav digirt û gahî dayê

Heta ku gihişte heft-i salan
Babê wî ji nû kete xeyalan:

Reb daye me ev delalê meqbûl
Dê wî bikim ez bi ilmê meşxûl

Nabe ji wî re tu kar û sen'et
Ez xeyrê ilmê neke tu xizmet

Ilm sen'etekî gelek temîz e
Herçî ku xwedanê ilm, ezîz e

Meqbûl e li nik 'ewam û xasan
Ez cin û melek, perî û nasan.

Yek rojê ji rojehayê mes'ûd
Bîl cumle eşîrê kirne mewcûd

Bê hed û 'eded cemel deranîn
Mecmû 'î kirin ziyafe, danîn

Hemîyan ji Qeysî re du'a kir
Babê wî bi destî girt û rakir

Bir danî di mekteba 'ulûman
Wek bedrekê kefte nav nucûman

Gava ku dihate pêşê ustاد
Seyda weh dibû muferreh û şad

Dersa xwe ji carekê ziyade
Nedxwend û wuha wî kiribû 'ad

Seyda çi digote wî cuwanî
Ew dersê bi carekê dizanî

Eqlê wî ziyade musteqîm bû
Hem sahibê teb'ekî selîm bû

Elqisse, ku medresenişin bû
Fikra wî li ser 'ulûmê dîn bû.

Ya Reb tu bikî nesîbê Xakî
Wî jî tu bi aliman teba kî

Min hêvî heye ji Rebê ekber
Nêv ehlê 'ulûm bikit me defter

Roja ku dikî qiyamê sa'et
Nav aliman bême ber şefa'et

Ya Reb tu Xakiyê gunehkar
Mehrûm nekî ji şahê Muxtar.

**BENDA DIDUYA
DI BEYANA ÇÜNA LEYL Û
MECNÛN MEKTEBÊ
Û AŞIQBÜNA WAN LI HEV**

Mî'marê kuhen serayê îxbar
Neccarê serîr ê neql û asar

Evrengehe wî gerandî bunyad
Ev qesrê kuhen bi ilmê ustاد

Go: Pêşî niha zemanê sabiq
Şeyxek hebû ew di hukmê faiq

Ger çendî bi şeyxîtî 'eyan bû
Lêkin ewî şeyxê 'urbiyan bû ?

Sahib deve û pez û feres bû
Pir mekremet û xwedanhewes bû

Suqlabî û nejdî û mu'enneq
Mecmû 'ê ewan bi zîn û me'req?

Ecnasê xeyûl û new'ê uştur
Mewla kiribûn li nezdê wî pur

Esnafê cewarî û peristar ?
Her yek bi mîsalê durrê şehwar

Îsasîfet ew bi nutq û ezman
Yek lehze dikin heyatê sed can

Pir bûn ewan di xîmeyê reş
Teşbîhê sema û kewkebê ges

Destbesteyê xizmetê kemer bûn
Wek serwîsehê muqîm li ber bûn

Enwa'ê Ereb mutî'ê hukmet
Ehlê Yemenê hemî di xizmet

Serdarê eşayirê Yemen bû
Meskengehê wî muqîm çîmen bû

Her dem vedida siyahê xane
Teşbîhê qubabê asîman e

Nêv çîmen û lalezar û sunbul
Nêv çîçek û sosin û gul û mul

Guhdarî dibûn sedayê teyran
Ageh nedibûn ebed ji xeyran

Qîzek wî hebû şebîhê xurşîd
Peyda bibitin ji burcê ummîd

Nêv baxê melahetê tezerw-ek
Qametkişayî şubuhê serw-ek

Kîsû bi şebîhê miskê Tatar
Berdaye milan bi rengê şehmar

Zulfeyn ku dibûn li dêmê mureteb
Wek şemsê biçîte burcê Eqreb

Çeşmê di belek, kemanê ebrû
Rengşubhetê sorgulan e her rû

Her xalê siyeh li dêmê nûrîn
Wek şahê Hebeş li textê sîmîn

Cebhet bi mîsalê fecrî sadîq
Mecnûnî dibin ji pêş ve aşiq

Weqtê dimeşî li ser zemînê
Aşiq dimirin ji ber evînê

Gerden bi mîsalê yek surahî
Purbade û tazeyê mubahî

Me'zûn bike awurêن di celad
Mecmû'ê cîhan dikîte berbad ?

Ger dêm bike ez hîcabê 'arî
Şemsa li felek dibîte tarî

Leyla ewê babî îsmî danî
Ez naqîlî min wuha dizanî

Hikmet ji Xweda weh bû muretteb
Babî bir û xiste nêv mekteb

Teqdîrê Xweda bû her ew û Qeys
Der menzilekê dixwendin wan ders

Ba emrê xwedayê Reb ê Cebbar
Dersê xwe bi hev re kîrin tekrar

Mekteb ku dibû li herdu xelwet
Xweş-xweş dikîrin bi hev re suhbet

Yek rojê bi emrê şahê Mewla
Qeysî nezerek didaye Leyla

Qencî lê fekirî, weh lê nezer kir
Cergê xwe ji wê tijî keder kir

Carek fikirî li zulf û xalan
Eql û dil û can didaye talan

Murxê dilê wî kete hewayê
Bê Leylê tu carî qerar nayê

Leylê jî nerî li Qeysê aşiq
Derdê wan bi hev re bû muwafiq

Neku bi dilek, bi sedhezar dil
Ew jî weh li Qeysî bûye mail

Hem aşiq û herdu bûne maşûq
Ez ateşê işqê bûne mehrûq

Gava ku dixwendin û dihatin
Mehdda nezer ew li dersê nadîn

Îlla ku dikîrin erzê ehwal
Hetta ku belav bin ew biçin mal

Miqdarekê xweş bi vî meqamî
Sotin xwe di ateşê mudamî

Wan her weh digo ku kes nizane
Nageh fikirîn ku bû 'eyan e

Teşbîhê miskê nake mestûr
Bihna wê dibe belavî ez dûr

Elqise, hinek ji xelqê dewran
Der goşî kirin hîkayeta wan

Çûn gotine wan bi lefzê şîret:
Tîştê wuhe 'eyb e nik eşîret

Babî di we her yekê wezîrek
Her yek ji ewan xwedan' eşîrek

Ger pê bihesin û ger bibînin
Çavê di we herduyan derînin.

Tenbîhê kirin bi we'z û îhsan:
Da seh nekitin ji we çu însan.

Şîret ku temam dikirin û rabûn
Gotin hemî çûn û berhewa bû

Bê fayîde bûn, nekir ewan gûş
Yekcarê nemane eql û ne hûş

Zêde bi fixan û ah û hesret
Her weqt tereqî yû bi kisret

Heta ku hemî qebîl û eqwam
Mecmû 'ê eşîr, xewas û e'wam

Têk pê hesiyan, kirin hîkayet
Bîl cumle ji hev dikin rîwayet

Nêv ehlê Qebîleyê 'eyan bû
Her meclisi behsê îşqê wan bû

Heta ku gihişte babê Leyla
Sahibedeb û xwedanê xeyla.

Weqtê ku bi behsê bûye ageh
Bê hed kete şermekê ji nageh

Êdî nedîhişt ku ew perîzad
Yekcarî biçite pêşê ustad.

Bulbul ku ji xunçeyê qetandin
Ah û keseran çiya helandin

Ket behra fîraqê Qeysê naçar
Sed dad û meded, fixan û hawar

Der ateşê hicrê bûye sûzan
Rahet qe nedî ne şeb ne rûzan

Ma zar û zelîl û maye mehzûn
Ez çeşmî diçûn sırışkê purxwûn

Alem hemî pêk ve bûye ageh
Der hukmê Xweda de mane waleh

Hindek ji xwedanê qelbê nazik
Herçî ku di rahê işqê salik

Weqtê weh didîtin ew belakêş
Bîl cumle ji bo dibûn cîgerrêş

Bêçare ci kefte işqê xeddar
Ewnet bide wî Xwedayê xeffar

Hindek ji mirovê eqlê napak
Gava ku didîtin ew cîgerçak

Wan weh digo: *Ev çiqas dîn e*
Ser qîzekê hay ji xwe tu nîne

Çen darê bi cî li wî bidana
Fûl halî dibû bi eql û dana.

Axir qe nema tehemmulâ wî
Her zêde fixan û xulxula wî

Leylê weh kir ew bi işqê meftûn
Navê wî ji nû ve kirme "Mecnûn"

Babê wî nehiştî qet tu carê
Ew derkeve badî û seharê

İlla ku muqîm di navê xîme
Teşbîhê bedir di navê xxîme

Mecnûn ku dihate dorê obe
Wî dewrê dikir hezarî newbe

Her fetil didan li dorê çadir
Qet sekin nebû muqîmî sair:

Carek nezerek bidim li Leyla
Daîm bi fixan û wayêweyla!

Dengê wî hukum dikir li Leylê
Hêstir dewanî bi mislê seylê

Naçarî dikir libasê bavê
Lê xewfê dikir ji dê û bavê:

*Axir çi bikim neşim çi bêjîm
Dê her wehe hêstiran birêjîm*

Lêkin bi dizî, neku 'eyanî
Wî eşkê di xwîn bi şubhê kanî.

Mecnûnî hebû hinik ji ehbab
Çendik ji dilawerê di i'râb

Exleb nedibûn ji wî qe xafil
Daîm dikirin teselliya dil

Her subhê digel evan hevalan
Meşmeş dimeşîne ser cîbalan

Taîfeyê babê Leylê daîm
Nêzîkî cebel dibûne qaîm

Ew jî ji çiya dihate xwarê
Heta li etek diketî qerarê

Wî her dinerî li xîme ez dûr
Sed ahî diçûn ji qelbê mehcûr

Mecnûn û ewan heval û yaran
Rengşubhetê ttaviyê di baran

Hêstir weh dikirne xwar bi carek
Te digo ku, çiya bû lalezarek

Ger-geh ku dihate bayê şêrîn
Ez aliyê yar, digirtî wî bîn

*Keyfxweş weh dibû bi bûyê dîlber:
Sankî ku cîhan hemî seraser*

*Emlakê min in bi cumle esya
Weqtê ku dihatî bûyê Leyla.*

Her pêlekê ba ku tê ji pêra
Mehbûbê dike selamî vê ra

Goyende dibû digel ssebayê
Her daîma wî digote bayê:

*Ey badê seher hinek selaman
Mexfi tu ji min bigîne canan*

*Behsa minê zar ê bêmecal ke
Hindek ji mi re tu erzê hal ke.*

Gava ku tuyûr û kebk û heywan
Wan rê diçitin di pêşê xeyman

Agir dikeve dil û hinavan
Hêstir dirijin ji herdu çavan:

*Xwezya ku mi jî wekî we teyran
Perwaz bikira li nîvê dewran*

*Carek bifirim li nava Îlê
Çavek bixim ez li qeda Leylê.*

Karê wî weh bû di dewrê salê
Têr ahî dikir, dihate malê

Dîsa subhek digel tewabi'
Çû û ku ji dûrî bibîte qani'

Wî da nezerek digel dused ah
Çeşmê wî li Leylê ket ji nagah

Rûniştiye wek bedir li ser cî
Hêstir diwerîn bi mislê încî

Ez hesretê hîcr û derdê Mecnûn
Mabû bi tenê zelîl û mehzûn.

Mecnûn fekirî li çarî etraf
Xalî, tu ne kes ji mîr û jin saf

Leylê weh kişand ji hedde zêde
Bê hemdê xwe rabû çû bi pêş de

Çend ahî kişand û çendî hesret
Leylê ku dî ew ji kefte hirqet

Derdê xwe ji hev re kirne qiset
Hicran ji xwe re kirin hîkayet

Mecnûn xwe negirtî, da fîxanan
Weqtê weh ku dî cemalî canan

Kir welwele û hewar û gazî
Yekcar ji lîbasê maye tazî

Hindî weku bû ji şurbê mexmûr
Dengê wî nebû di perde mestûr

Ehbabê di wî ketin xiyalan:
Dê bête peder bi 'emm û xalan

*Mecnûn û me jî digel teba kin
Mecmû'ê me ruh ji me cuda kin.*

Hatin meriv û ehl û cîran
Bihnek weh li Qeysî mane heyran

Wan girte bi destehayê Mecnûn
Ew derdîkeşê bi işqê meftûn

Derxistin û ew ji xîmeyê reş
Pê re meşîyan ne penc û ne şeş

Mecmû û berê xwe dan çiyayî
Bil cumle bi wî re kir tebayî

Heta ku birin cebel bi wî re
Hindek teselî kirin ji wî re

Wan her berê xwe didaye malan
Ew jî gerrî, çûye nik hevalan

Karê wî muqîm li çol û sehran
Şubhê felek bi fetl û dewran

Ya Reb tu Xakiyê gunehkar
Mehrûm nekî ji şahê Muxtar.

**BENDA SISIYA
DI BEYANA XWESTINA BAVÊ
MECNÛN LEYLAYÊ
JI MECNÛN RE
Û NEDANA BAVÊ LEYLAYÊ**

Qeysê ku nema wî xwab û rahet
Babê wî bihîstî ev hîkayet

Çû lê geriya, ku wî bibîne
Ya salixekî ji wî hilîne

Pirsî ji ehaliyê Qebîle:
Der sihet e, yane ew 'elîl e?

Xelqê ku ji qisetê xeberdar
Gotin ku: Bi işqê bû giriftar

Medhûşî bûye bi işqê Leyl-ek
Qet nîne li malê sebr û meylek

*Îlla ku muqîm li çol û badî
Mesken wî li nêv newal û wadî*

*Geh-geh digere li dorê Eylê
Ew taifeya ku tê de Leylê*

*Dê ahî bike, bide fixanan
Da dengî biçite goşê canan.*

*Babê wî ku qenc-i hal dizanî
Hêstir kişiyan bi şubhê kanî*

*Gah ew giriya û geh dinale
Go: Feyde tune, girîn betal e*

*Ger zû dê nekim ji bo wî çarek
Nayê me sebr û ne qerarek.*

*Xuddamê di Obe gerandin
E'yanê Eşîretê civandin*

*Go: Qeysê me bûye zar û sêfil
Daîm bi fixan e, şubhê bilbil*

*Kanê çi dikin ji bo me gotin?
Min cergî bi ahê wî re sotin!*

*Wan go ku: Hemî bi hev di naz in
Çin Leylê ji babê wê bixwazin*

*Taifeya me bi mal û dewlet
Zêdetir e hem bi nam û suhret*

*Hindî ku qelen li me buha din
Dê cumle bidin, mebên ku nadîn.*

Rabûne meşîne şeyx û e'yan
Nêzîkî kirin li Obeya wan.

Wan daye cewabê, ku: *Ehlê 'Amir* *
Hat seyxê ewan û hem ekabir.

Weqtê ku bihîstî babê Leylê
Rabû meşî ew bi pêş ve xeylê

Anîn û hemî li kon peya kir
Îkrameke pir ji boyî wan kir

Piştî ku ziyafeta xwe danîn
Nan xwarin û sifre wan hilanîn

Êdî qe nema tu iş û xizmet
Hêja vekirin ji nû ve suhbet

Ewel wehe gotî babê Mecnûn:
Em herdu dema be hev re rabûn

Teşbihê bira bi hev re sadiq
Heta bi nuha muqîm muwafîq

Gotin ji te re bikim îfade
Dostî me deha bibit ziyade

Hatin tu bikî me cumle memnûn
Leylê tu bidî ji boyî Mecnûn

Tezwîc bikin bi emrê Xaliq
Herdu gelekâ ji hev re laiq

* *Ehlê 'Amir*: Ehaliyên eşîra Binu 'Amir in, ya ku
Mecnûn jê ye.

*Hemrahê di wî jî kirne mebhес
Leylê tu kerem bikî, bidî Qeys*

*Em cumle wuha rewa dibînîn
Xeyrî vê ne keç, ne kur te nînin*

*Me lûmê te ye ji xeyrê Mecnûn
Wî jî tu weled Xweda nedabûn*

*Mecmûî rica dîkin bi hêvî
Qîza xwe bidî ji bo kurê wî*

*Hûn herdu bibin murov û hemdem
Ser cumle Ereb dîbin mu'ezem*

*Qet nîne kesek li ber we rabin
Dê cumle neyarê we yî fena bin.*

*Go: Gotinê we di bê quşûr in
Ser herdu 'uyûnê min qebûl in*

*Lêkin keça min nuha sexîr e
Ne layiqê xwestina Wezîr e*

*Hindek tu bide me mehlê
Heta ku mezin be, bête hewlê.*

*Kî ser te re çêtir e xuyayî
Ez wî bigirin bi eqrubayî?*

*Ger ew bimire tu çare nabe
illa ku bimîne dê ji te ra be!*

*Wan gotê: Tu qet 'uzir mexwaze
Ev 'uzrî meger ji bo cihaz e*

*Muhtac-i nehin ji bo cîhazan
Ser me tu meke tu fexr û nazan*

*Hindî ku qelen li me mubah kin
Em dê bidin û nuha nîkah kin*

*Em hatine û kusan bidîne
Mehriyê bibirrin, bira bimîne*

*Keyfxwes bibe bike me mesrûr
Heta tu nedî ji bo me destûr*

*Em behsê nekin di weqt û gavê
Leylayê nebin ji mala bavê.*

*Îsrarê kirin ji boyî înkah
Ez heddê ziyade kirne îlhah.*

*Wî dî ku xelas ji destê nîne
Gotî: Puseret eqil tu nîne*

*Dîwane ye, wî tu nîne warek
Her rojê li çolekê qerarek*

*Etrafê Qebîle gahî daîr
Daîm bi fixan, muqîmî saîr*

*Ger çare bibe ji bo kurê te
Leyle nebe can li oxirê te*

*îlla ku nebe ji wî re çare
Nêv dost û neyar ji bo me ar e*

*Xelq ê weh bibêje "duxterî pak
Da dînekî, ne eqil ne îdrak"*

*Min hêvî we dil nebîte meksûr
Hûn dê bigirin nuha me me'zûr.*

*Axir ew e; nadim ez tu duxter
Nabe ji me ra wuha muyesser.*

*Weqtê ku ewan nema tu hêvî
Rabûn û meşîn bi sernîşîvî*

*Hatin û li Qeysî bûne wa'iz:
Em hêvî dikin nebî tu 'aciz*

*Qîz bê 'eded in di nava Eylê
Sed carê xweşiktir in ji Leylê*

*Kîjan te bivê, ji bo te bînin
Malê we di oxira te dînin.*

*Herçî ku hebûn keçê di bakir
Bîl cumle ji wî re wan hîsab kir.*

*Mecnûn kubihîstî ev xeberdan
Yekcarî bi derketî ji perdan*

*Derba li wî derbekî xedar e
Pêşîr li xwe kir wî pare-pare*

*Bû zêde li wî cunûn û dînî
Hem ah û fixan û hem hezînî*

*Der şeb diçû pêşê mahîtabê
Cerg û dilê xwe dida kebabê*

*Her wî ji xwe re dikir tekellum
Ebyatî dikirne wî ternnum:*

*Hatim birrîn ez ji xwab û xwarin
Min nîne tu rahet û vexwarin*

*Mam zar û zelîl, bi derdê meşxûl
Dergahê wesil li ber me meqfûl*

*Hêja vebû nû derê hîcret
Umîdî nema li babê weslet*

*Rojê min ê pir bi ferh û şahî
Ez xem li me bûn şebê siyahî*

*Lesker ji xeman li min cema ne
Ehbabê fereh kesek nemane*

*Teyrê di fîraqê bûne sef-sef
Danîne li ser serê me ref-ref*

*Navê min î zar, qelbê xwûnî
Hê nû kete deftera cunûnî*

*Ez bûm bi cunûniyê muleqqeb
Serdefterê wan ez im muretteb*

*Dostê di me bûne sahibehzan
Duşmen hemî bûne surûr û şadan*

*Pir xem ji fîraqê bûme naçar
Axir me bi dînî kirye îqrar.*

*Geh-geh weh digo ji bo xwe daîm:
Leylayê di suhbeta kî qaîm?*

*Aya gelo ew bi min xebîr e
Ya ne ji bin ez kirim jibîr e?*

*Ev dûd û fixan û nale û ah!
Aya qe dibe bi halî agah?*

*Carek çi dibû selam û teslîm
Bo me bikira xelat û te'zîm?*

*Ev qelbê hezîn ê pir kul û jan
Xalî bikira ji derd û ehzan?*

*Aya eceba dibe tuyesser
Carek bigihîme qedê 'er'er?*

*Wî ahî dikir û dida hewaran
Herçî dibihîstî şubê baran*

*Ew jî digirîn, cîger disotin
Hindî ku wî ev xeber digotin.*

BENDA ÇARA
BIRINA MECNÜN KE'BÊ
Û DU'AXWESTINA MECNÜN JI
BOYÎ ISQE

Babê wî helî ji derdê wî re
Qet çare nedî ji derdê wî re

Hindek ji mirov û ehlê aqil
Ew bo pederî weh bûne qail:

*Derman li birînê Qeysî nayê
Îlla ku bişînî Beytullayê*

*Ed û yye dibin li Beytê meqbûl.
Nik babê wî ev xeber bû meqbûl*

*Kir kar û tedareka Hîcازê:
Em dê ji Xweda bikin niyazê*

*Belkî bide Qeysê min selamet
Derxîne ji elbîsê melamet.*

*Wî textîrewanek anî kar kir
Qeysê xwe bir û li wê suwar kir*

Ket rah û meşî bi roj û hem şeb
Heta ku diçûne Ke'beê Reb

Wî girtî bi destê Qeysê pîrxem
Bir nik Hecer û Hettîm û Zemzem

*Go: Bo xwe bike hin du'a ji Barî
Belkî bibî tu ji işqê 'arî.*

Hîna ewî behsa işqê kir gûş
Yekcar nemane eql û ne hûş

Kir ah û xwe da li erd û dîwar
Wî girtî bi perde û bi estar

*Go: Ey ehed û xwedanê qudret
Ez hatime barîgahê rehmet*

*Ya Reb tu bi hurmeta Resûl kî
Îro tu du'ayê min qebûl kî*

*Heta ku tu 'umrê min fena kî
Işqê tu muqîm bi min teba kî*

*Meqsûdî ew e ku işqê dildar
Her rojê bikî ziyade sed car.*

Babî kubihîstî dengê de'wet
Go: Çare ji bo wî bûye zehmet!

Berda girê û kir ah û nalan
Wan herdu berê xwe daye malan

Mecnûn û peder ji Ke'be rabûn
Hatin ku li mala xwe peya bûn.

Dîsa ku li ser terîqê ewwul
Ket dora Qebîle şubhê bulbul

Kir ah û fîxan û dad û hesret
Her weqtê li wî ziyade herqet.

Hindek ji minafiqê di Eylê
Ew çûne Serayê Babê Leylê

Wan gotî ji wî re: *Ey nîkunam*
Vî bêedebî kirî tu bednam

Her rojê li dor Qebîle peyda
Riswa kirin em wî dînê şeyda.

Weqtê ku ewan kelam eda kir
Bê hed û hîsab ewî heya kir

Ew hakimê cumleyê Eşîret
Pir hate xezeb û hate xîret

Go: *Ger evî malê xwe li ser kim*
Dê wî bikujim û hem bi ker kim.

Tenbîhê kirî li qewm û xudam:
Her weqtê we dî, bikin i'dam

Wan 'ezmî kirin li qetla Mecnûn
Babê wî bihîstî, bûye mehzûn

Wî ruh firiya ji cismî derket
Wî eqflî nema, nebû çu rahet

Rabûn û ketin newal û gazan
Nêv dar û ber û çiya û sazan

Hindî geriyan li deşt û sehran
Peyda nekirin tu nam û nîşan

Umîdê bîrrîn û hatine mal
Teşbîhê Ereb bi şî'r û eqwal

Ser Qeysê xerîb kirne me`tem
Mecmû'ê Eşîrê bûne sersem

Bîl cumle neman rica û umîd.
Merdek ji Qebîla Îbnu Se îd

Der rahî diçû û dîtî yek merd
Işqê kiriye zeîf û ruxzard

Qet nîne sekin ne wî qerar e
Her dem ewî gazî û hewar e

Eşkê wî bi şubhê av û kanî
Teşbîhê meter ji asîmanî

Her têñ û qe nadînê tu muhlet
Bihnek tune boyî wî suhûlet

Cû bal ve gotê: *Te çi hal e*
Her dem bi fixan û ah û nal e?

Derdê te çi ye, çira dinalî?
Nîne te sukûn û her dikalî!

Qet seh nekir û neda cewabek
Hindî sekînî nekir xîtabek

Ew jê bihurî û her rewan bû
Rahê wî di nêv Qebîlê wan bû

Weqtê weku çûye nava konan
Her kes bi enîn û şîn û efxan

Pirsî: *Çire hinde xelq û adem*
Bîl cumle xwedanê şîn û matem?

Gotin: *Puserek me kirye xaib*
Babê wî nemaye ruh di qalib

Mesken wî li nava dar û ber bû
Wek aşê muqîm bi fetl û gerr bû

Pir lê gerriyan, nedî me yekcar
Axir bi mirin me kirye iqrar.

Go: *Mujde ji bo we ehl û eqwam*
Ez bo we bikim beyan û i'lam;

Hûn hêstirê xwûnê bes birêjin
Min dîtiye ê ku hûn dibêjin;

Mesken wî di nêv filan newal e
Pir zar û zelîl û bê mecal e.

Wan dane xeber ji boyî babê
Keyfxweş bû gelek bi vê cewabê

Rabû û digel hinek hevalan
Bîl cumle bi derketin ji malan

Ew çûne ewî mekanê me lûm
Rûniştiye tiflê işqê me'sûm

Bin yek kevirî xumar û medhûş
Me'yûs û zelîl û cismî naxwûş

Cismê wî bûye bi tozê mestûr
Der çeşmî nemaye ruhnî û nûr

Bêçare bûye, ne eql û ne fîkr
Her Leyl e li ser zebanê wî zikr.

Babê wî ku bûye pêş-muqabil
Hêstir ji 'uyûnî bûne sail

Go: *Ey ferehê dil û hinavan*
Wey ruhniya çeşmê dê û bavan

İşqa te ci işqekî xedar e?
Qet nîne ji bo 'ilac û çare?

Bê dawî ye, qet xelasî nabe?
Ev derdê te qet qiyasî nabe?

Çesmê xwe hilanî maye wale
Ket ser qedemê peder bi nal e.

Uzrê xwe rica kirî ji bavê
Dev xiste qedem de weqt û gavê

Go: *Ey sebebê heyata canim*
Sermayê 'umr û zendegan im

Ez kaseyê işqê bûme mexmûr
Pir bûme ji xizmeta te ez dûr

Lêkin ci bikim bi hemdê nînim
Ez girtiyê hakimê evîn im

Ez kirme ji bo xwe 'ebd û kole
Lewra me mekan çiya û çol e

*Dîwane kirim, eqil ji min bir
Eqlê me bi dîniyê bedel kir*

*Emrê wî wuha ye her medamî
Qet sekne nebe li yek meqamî*

*Ez hêvî dikim bikî tu me 'zûr
Teqsîrê di min bikî tu mexfûr.*

Mecnûn ku temam-i kir xeberdan
Babî kire ah! ji kul û derdan

Go: *Ey puserê melûl û bedhal!
Çawa tebihêlim ez biçim mal?*

*Em dê ji diya te re çi bêjin?
Her dê wehe hêstiran birrêjin!*

*Walîde bûye ji eqlê xawî
Dîn bûye ji hesreta te lawî*

*Daîm bi girîn û ah e her dem
Ez derdê te bûye cunûn û sersem*

*Îhsan bike, guh de şîretê min
Mehzûn-i nekî Eşîretê min*

*Rabe bi me ra bibe beraber
Da ez te bibim li pêş mader*

*Dev berde ji vê hewayê carek
Belkî ji te re bigîne carek.*

*Weqtê wehe gotû bab ji bo wî
Mecnûnî kir ev cewab ji bo wî*

*Go: Ey ruh û qalibê di Mecnûn
Hindî te xezîneyê di meknûn*

*Pur serf kîrin ji heddê zêde
Bo derdê me qet neda tu fêde*

*Derdê evê işqê defî nabe
Hindî ku li hev bidî xerab e*

*Neku me bi hemd û ixtiyarî
Xwe xistiye ev cunûn û harî*

*Teqdîrê Xwedayê la yezal e
Wî daye min ev girîn û nale*

*Hem zulfê Leylê mislê zencîr
Keftine 'unuq bi xeyrê teqsîr*

*Qatqatî li dorê bûne helqe
Der agirê işqê kirme herqe*

*Qet mumkin e ez ji wê riha bim?
İlla di vî halî de fêna bim!*

*Hêvî dikim ez ji te bi îhsan
Aciz nebî tu ji ah û efxan*

*Aşıq ew e her girîn teba be
Ev işq ê tu carî me 'ne nabe*

*Tu lutfê ke, dil ji min mehêle
Her min di vî halî debihêle.*

*Mecnûn ku xeber temamî gotin
Cerg û dilê babê xwe disotin*

Bêçare peder weh bûye giryân
Bo wî puserê cîger tijî jan

Mecnûn ku dî halê babê naçar
Ew jî girî, kir fixan û hawar

Miqdarekê herdu law û bavan
Xwûnabê rijîn ji çar-i çavan

Axir ku xulas nedî ji destan
Mecnûn meşîya xumar û mestan

Mecnûnî digel peder bi meş hat
Babê wî gelek bi dilkî xweş hat

Hatin ku di kon-i bûne sakin
Walîde û cumle ehl-i hatin

Wan kirne teselî boyî Mecnûn:
Bes tu birrijîne eşkê pirxwûn.

Bo xatirê wan du-sê eyaman
Rûniştî di kon de bûye mihman

Hasil nedîşî bike sukûnê
Her fîkr û xiyalê wî li çûnê

Behra dilê wî bi pêl û coş hat
Bê hemdî bi gazî û xuroş hat

Dîsan kete çol û deşt û sehran
Mesken tune, şubhê avê behran

Her dem bi hewar û wayêweyla!
Dewran dike ew bi işqê Leyla.

**BENDA PÊNCA
DI BEYANA HALÊ LEYLÊ
Û BÊZARIYA WÊ JI DESTÊ ISQÊ**

Mecnûnî me hiştî di halê wî de
Her gerr û fetil di tav û sî de

Leylê bikin em ji nû hîkayet
Kanê di çi derdî ew dinalet?

Husna wê bi şubhê Bedra Çarde
Her şeb dibilitin hinek ziyade

Mislê wê nehin ji nazenînan
Ne di nav beşer, ne horî 'îynan

Ew jî weh dibû li Qeysî meftûn
Derdê wê xerabtir e ji Mecnûn

Emma çi bike ji dê û walid
Nedşî here der, muqîmî qa 'îd

Îşqa xwe dikir ji wan ê pinhan
Qet pê nedizanî kes ji însan

Weqtê ku li wê dibûye xelwet
Wê ahî dikir ji derdê firqet:

*Mecnûnê min ê zelîl û gîryan
Aya eceba li kê der îskan?*

*Yane digere, bi ah û nal e?
Sehra kirî şubhê bax ê lale?*

Weqtê weh digo (bi) qelbê şewat
Hêstir dirijîn ji "ssat"ê safat *

Geh-geh li çiya nezer dikir wê
Ew ciyê ku Qeys guzer dikir lê

Bihna wî digirtî wê ji bayê
Derdê xwe hinek sebir didayê

Geh xelqê diçûn li rê û durban
Wan behsê dikir ji Qeysê 'uryan

Ebyatê wî boyî hev digotin
Leylê dil û can didaye sotin

Leylê jî hinek ji şî'rê mewzûn
Wê go li xwe û li halê Mecnûn

* Ji rêza pêşî heceyek kêm bû, me "(bi)" nivîsî. Bi vî awayî hem hece tê dagitin û hem jî daçek çêdibe .

"Ssat"ê safat, nivîskar çavêن Leylê şûfandiye bi tipa
"ssat" a di elîbêtika erebî de.

Hasil nedîhiştî kes ji însan
Ew pê bihesin bi işqa sûzan.

Her çendî keçê di wê Eşîret
Her dem tereb û bi keyf û suhbet

Qet guh nedidaye keyf û seyran
İlla ku muqîm sukûn û heyran

Wan her weh digo keçê di nazik:
Leylê li terîqa işqê salik!

Daîm weh didanê te'nê napak
Her weqtî wuha melûl û xemnak

Salekbihurî wusa temamî
Ageh qe nebûn bi wê tu 'amî

Sala dinê nûbuhar û Newrûz
'Uşşaqqê ji nû ve bûn cîgersûz

Mehpare keçê Eşîrê rabûn
Bîl cumle bi cunbuş û sefa çûn

Têkda bi tebayî çûne bustan
Cennet tijî bû ji hor û xilman

Hindek didin ew li def û saz
Hindek bi reqsê bi 'îşwe û naz

Hindek wekî gul bi xende û ken
Sorgul tijî bûn di nava gulşen

Leylê bi mîsalê xunçeyê gul
Meqbûz e dihen ji derdê bulbul

Wan her weh digo ji boyî Leylê:
Ey duxterî padîşahê Eylê

Ev keyf û hewa û reqs û govend
Ev nay û newa û saz û sazbend

Bîl cumle ji bo te ne, mûbarek!
Qet nakî bi bal ve meylê carek?

Wê go: Hemî bo min e dizanim
Îro hinekî giran e canim!

Keyfa me tu ne, hinek nesaz im
Ne mailê ferh û nay û saz im.

Lêkin ji xwe re dikir tefekkur
Mecnûn di xiyalê de tesewur;

Aya di kîja cî û mekan e
Bo min bi girîn û ah û jan e?

Nageh fikirî li paşê dîwar
Yek merdî dike ji Qeysî îxbar

Eş'arê di Qeys ê pir kul û derd
Der rahî diçe dibêje ew merd

Leylê kire xwar sîrîşkê pirxwûn
Weqtê ku bihîstî behsê Mecnûn

Agir kete qelb û cergê êşan
Çend hesretê kûrî wê dikêşan

Lêkin go, keçek di kokê yek dar
Rûniştiye ew li Leylê guhdar

Da pê bîhesim li kê ye mail
Ewçendî sîrişk ji çesmî sail?

Leylê ku kirî bi dengî eş'ar
Keç zanî li Qeys e ew giriftar

Êvar-i ku bû û hatine mal
Çû cumle ji dê re gotî ehwal

Walîde vemaye der teheyjur
Wechê wê gelek ketî texeyjur

Go: *Hêvî dikim ji te delalê*
Tu behsê nekî evê meqalê

Pur eyb e jo bi me, hem fezahet
Nêv Èlê dîbin xwedanqebahet.

Paşê çû li Leylê kirye şîret
Gotin ji wê re hinek ji şîret.

Bê faîde ne xeber ji bo wan
Herçî bi işqê bûne nîşan

Leylê kete halekî dîgergûn
Daîm heliya ji derdê Mecnûn.

**BENDA ŞEŞA
DI BEYANA ÇÜNA İBNU SELAM
SEYDÊ DE**

Rawî wehe gote min hîkayet
Ew rawiyê sahib ê fesahet

Go: Weqtê zemanê Leyl û Mecnûn
Êlek Ereba ji heddê efzûn

Ew sahibê mal û mulk û cot in
Navê wê Benî Esed digotin

Yek hakimê wan hebû, cuwan bû
Nêv cumle Eşîra xwe 'eyan bû

Navê wî Binî Selam bizane
Mecmû 'ê qebîl xulam bizane

Hukmê wî li ser Eşîrê carî
Hez kirbû wusa Xwedayê barî

Rojek bû suwar digel hevalan
Çû seydê bike hinek xezalan

Ew her digerrî li seyd û nêçîr
Xellaqê cîhan weh kirbû teqdîr

Nêzîkî dibû li wê Qebîlê
Ew taîfeya ku tê de Leylê

Leylê jî hinek ji qîzê nadir
Anîn û digel xwe wê teba kir

Wan helqe li dora wê digêrran
Teşbîhê bedra li nêv sitêran

Bîl cumle bi derketin ji konan
Der rahê meşîn bi zad û hem nan

Teşbîhê bi horiyê buheştê
Meqsûdê ewan biçine geştê

Weqtê ku wusa li rê rewan bû
Ba İbni Selamî pev 'eyan bû

Hîna ku dî husna Leylê çun bedr
Fil hal wî dî ku teng-i bû sedr

Bû aşiq û mubtela û êsîr
Meyla wî nema li seyd û nêçîr

Ket qelbê ewî hewa û xulxul
Pursî go: *Ji baxê kî ye ev gul?*

Wî salixê Leylê giş hilanî
Babê wê kî ye ewî dizanî

Wî seyd û şîkarî xwe betal kir
Ket rah û tewecuha bi mal kir.

Weqtê ku peya dibû li malê
Ehbab hemî hatine hewalê

Hatin û tijî kirin cemaet
Da seydê bike ji wan re qiset

Wan dî ku tu keyfa wî tu nîne
Bê hedî melûl e, pir hezîn e

Pirsîn ji wî: *Ey xwedanê şewket*
Bo çi ji bo me nakî subhet?

Rûnuşti, te qet ne qîl û qal e
Daîm te tefekur û mitale?

Wî gotî ku: *Ey muhibê sadiq*
Ez bûme ji qîzekê re aşiq

Zencîrî kirim bi zulfû gîsû
Têtin dilê min xedeng ji her sû.

Wan gotî ji wî re: *Ey cuwanmerd*
Qet bo xwe meke xiyal û hem derd

Ger te bivê, dê subhê cewabê
Em dê bisînin ji boyî babê

Hindî ku bixwaze mal û eşya
Bîl cumle bidine babê Leyla

Herçî ku bi qîmet û semîn in
Mecmû û bidin, ji bo te bînin.

Bû şadî Binu Selamî, keyfxweş
Wechê wî vebû wekî gula ges

Wan dane qerar û dane teskîn
Bo Binî selam bi 'izz û temkîn.

Bû subhî ku roj-i bûye î'lan
Hatin civiyan Eşîr û e'yan

Hindek ji hediyeyê bi qîmet
Anîne bi keyf û ferh û zînet

Wê kirne tedarek û muheyya
Çendek ji ekabirê di 'ulya

Ew bûne suwar, li rahî qaim
Nezdîkî ku bûn li Îlî Hakim

Maqûlê qebîla Leylê tê de
Rabûn û meşîn û çûn bi rê de

Çûn pêşıya wan, bi 'izz û tekrîm
Anîn û peya kirin bi tefxîm

Rûniştin û qehwe wan vexwarin
Piştî ku ewan zewade xwarin

Rabûn û hedîye wan deranîn
Mecmû' li ber babê Leylê danîn

Gotin ku: *Bimu Selamî şandin*
Hatine keça te em bixwazin.

Gotî: *We qedem li ser serê min*
Ez xîmeyê we heta derê min

Canê xwe ji we re fîda kim
Leylê ji we re dirîxê nakim

Ev çendek e Leylê bê mecal e
Naxwoş e niha zeif e bê hal e

*Çend rij-i bidin ji bo me muhlet
Heta ku bibe ji eşê sihet*

*Em bo wê bikin tedarek û kar
Paşê bikin em ji bo we exbar*

*Hûn bêñ û bikin nîkah û tezwîc
Xemê di we cumle bibne tefrîh.*

Ser vê xeberê qerarê dayîn
Rabûn û meşîn bi ferh û ayîn

Ew çûne bi nik Îbnu Selam da
Ewel ewan li wî selam da

Rûniştin ew bi keyf û suhbet
Behsa xwe ji nû kirin hîkayet.

Bû Îbnu Selam bi ferh û mesrûr
Wan lê cebirandî qelbê meksûr

Bû şadî ji hed ziyade ferhan
Melhem kete nav birîn û cergan

Jê re vebû ew derê meqfûl
Her maye bi cunbuşa xwe meşxûl.

Leylê weku seh kirî xeberdan
Bê hiş kete ser zemîn û erdan

Weqtê ku bima tenê ji însan
Baran dirijî ji ewrê nîsan

Daîm bi fixan bû her şeb û rûz
Mecnûn jî li çolê her cîgersûz.

BENDA HEFTA BEYANA ÇÜNA NEWFEL SEYDÊ Û DİNA WÎ MECNÜN

Der weqtê ewî zemanê me'rûf
Şeyxek Ereba bi 'izz û mewsûf

Ew sahibê êleke giran bû
Bo malekî bê 'eded xwedan bû

Leşker wî bi şubhê qûmê behran
Xuddamî wekî nebatê sehran

Bîl cumle Ereb di emrî mewcûd
Newfel bû wî navê pak ê mes'ûd *

* Newfel serokê eşireke ereban bû. Rojekê ew diçe
nêçîrê li çolê Mecnûn dibîne, dilê wî pê dişewite û wî bi
xwe re dibe malê. Ew leşkerekî giran hazır dike û diçe
şerê bavê Leylê, da Leylê bi zor jê bistîne û bide Mecnûn.
Lê dema herdu alî şer dikin, Mecnûn ji leşkerê bavê Leylê
re dua dike, da li hember Newfelî bi serkevin. Nivîskar bi
vî awayî li çîrokê didomîne...

Rojek bû suwar digel xewadim
Bo seyd û şîkarê bûye 'azim

Derket geriya li çol û qefran
Da seydê bike xezal û teyran

Nageh kete goşê wî sedayik
Espê xwe bezand bi bal ve çapik

Dî yek merivekî bi şubh dolab
Dewran dike nêv çiya û exşab

Eş'arî dibêje, pir şewat in
Hêstir weh ji çesmê wî dihatin

Qet nîne li ser beden lîbasek
Ne sol û ne derpê û kirasek.

Wî dil şewitî bi halê "mecnûn"
Ev e xezîre û hêstirê xwûn

Pursî: *Te çi derd e, ey cîgersûz?*
Qet nîne sekin ne şeb ne der rûz?

Der çolê wuha zelîl û pîrxem
Hêstir dirijin ji çesmê pîrnem!

Kir ah û girî ji qelbê naşad:
Leylê kirime bi işqê berbad.

Nas kir ewî eş û derdê Mecnûn;
Ser qîzekê bû zeîf û mehzûn

Newfel bû gelek hezîn û mexmûm
Bo Qeysê esîr ê cergî me'lûm

Go: *Îro tu ne şîkar û ne seyd*
Derdê evî kirne payê min qeyd.

Gazî kire xadim û xulaman:
Bînin ji mi re hinek te'aman

Bo Qeysî kir iltîfatê bêhed
Mecnûn kete ser wî meylî bêhemd

Mecnûnî hinek ji şî'rê metbû'
Bo Newfelî got û kirye mesmû'

Awaz ku bi goşê wî resîde
Tesîrê kirin di qelbê wê de

Bo Qeysî kirin teseliyê xweş:
Tu qet meke qelbê xwe muşewes

Ger zorî û ger bi malê dunya
Leylê bikim ez ji bo te peyda

Leylê nekim ez ji bo te wasil
Qet bo xwe nekim tu keyfê hasil.

Mecnûnî ku kefte goşî awaz
Fil hal bi du'a ewî kir axaz:

Bo yek wekî min xerîb û bedhal
Bêmesken û bêlîbas û bedhal

Zehmet mekişîne tu ji bo min
Ji keyfa xwe memîne tu ji bo min ?

Yek şubhetê min ku bû perişan
Daîm li çiya û çol e îskan

*Leylê bi mîsalê durr ê yekta
Bêmisl, û qerîne nîne hemta*

*Qet mumkin e hor û nazenînan
Kes dê bidetin ji bo me dînan?*

*Axir, me bihêle der vî halî
Aciz mebe bo me bêmecalî.*

*Newfel weh digo ji boyî Mecnûn:
Çend sal e tu bûyî zar û mehzûn*

*Ferz be li min ez ku Leyla nazik
Bînim ji te re, tu qet meke şik*

*Lêkin ji te ez dikim ricayê
Dev berdî ji vê gerr û nîdayê*

*Çend rojî digel me bêyî malan
Xwe têxî qîyafetê hevalan.*

*Xweş hatî li Qeys û hem mizacê
Go: Dê ji me re bike 'ilacê.*

*Ew bûye bi Newfelî re hemrahd
Ba ferh û surûrê çû digel şah*

*Heta ku gihişte sehr û bajêr
Rûniştin û bûne rahet ew têr*

*Mecnûnî birin hemamê danîn
Qatek ji lîbasî jê re anîn*

*Elbîse kirin li Qeysê pîrxem
Ket sûret û şîklê îbnîadem*

Mecnûnî ku ez elem nexweş bû
Çend rijekî ma û me'de xweş bû

Daîmî bi Newfeli re şadan
Ew herdu dimeşîne baxê werdan

Wan xweş dikirin sefa û suhbet
Nav gulşenê mislê baxê cenet

Geh-geh xezelê di pak ê mewzûn
Ser Leylê digo zebanê Mecnûn.

Newfel ku dikefte goşî eş'ar
Tehsîn dikir bi sidqê guftar

Dewrek buhurî bi vê hewayê
Her rojê di cinbiş û sefayê

Newfel ku bi keyfê muttela bû
Mecnûn di xiyâlê wî nemabû

Mecnûn fekirî ku goşî nade
Halê xwe bi şî'rê kir ifade

Go: *Hêvî dikim ji te Emîrî*
Iznê bidî boyî vî feqîrî

Dîsa bikevim çiya û deştê
Ba cinsê wuhûşî her li gestê

Tesbîhê bi bulbulan bixwînim
Sebra xwe bi ah û nale bînim.

Mecnûn ku wuha kelamî gotin
Newfel bi wî cergî hate sotin

Wî emrî kire li ser 'esair
Da cem û bikin gelek 'esakir.

Esker bi mîsalê avê behran
Daîm kişiyan li rûyê sehran

Leşker ku temamî wî civandin
Êlçî wî li pêşiyê şiyandin:

*Hûn pêşde herin bi lez û te'cûl
Esker me kirî temamî tekmûl*

*Bêjin weh ji boyî babê Leylê
"Daxwazî dikin cenabê Leylê*

*Bo Qeysê esîrê zar û bêsebr
Newfel kiriye li me wuha emr"*

*Yaxud ku didî cewabê axir
Der weqtê xwe de bibe tu hazir.*

Weqtê ku weh go kelamî, êlçî
Fil hal xeyidî û rabû ez cî:

*Leylê bi husn tu nîne hemta
Çawa didim ez wî dînê sewda?*

*Ez hazir im her dem di gav û weqtê
Teqsîrê nekin, çi ku ji we tê!*

Qasid vegevê û hatiye mal
Bo Newfelî kir beyana ehwal

Newfel ku bihistû Leylê nade
Esker wî kişand û kefte cade

Ev herdu mulûk û komê leşker
Bûn qarşî bi qarşî herdu esker

Weqtê ku bi hev re bûne wasil
Hindek di qetîl û hin di qatil

Bû ne're û qîr û bû qiyamet
Qet nadine hev ji derbê muhlet

Çingîn kete tîr û şîr û rimhan
Xwûn bû lehî ez birîn û cerhan

Bê hed û hîsab ji hev dikuştin
Xwûnê wekî seylê meyit şüştin.

Mecnûn ku ji dûr ve lê nezer kir
Işqê di dil û cîger eser kir

*Go: Hêvî dikim ji Rebê qadir
Bo eskerê Leylê tu bî nasir*

*Ew eskerê ku bi Leyl e mensûb
Xalib bikî, qet nekî tu mexlûb*

*Ya Reb dikim ez niyaz û hêvî
Tu qet nedî wan sernîşîvî.*

Wî her weh dikir du'a ji Barî
Herçî dibihîst rica û zarî

Wan go ku: *Evî eqil tu nîne
Ev kuştin û şer ji boyî wî ne*

*Dîsan dike ew du'a ji hed der
"Leylê bikî xalib û muzefer"*

Bo eqlê wî wan kire tefekur
Der hukmê Xweda diman teheyur

Hikmet ji Xweda weh bû muqeder
Newfel şikiya bi hinde esker

Newfel fekirî ku nabe xalib
Wî ruh kişiya ji nava qalib:

*Yek êleke qet ne 'izzet û şan
Ewçend bibim ji ber perîşan*

*Ez hukmê nekim li navî E'rab
Bûm sermî li nîvê dost û ehbab!*

Nav eskerê wan bû keyf û suhbet
Ser Newfelî kirne sulhê minet

Ev herdu bi hev musalihe bûn
Newfel vegerî û gelkî mehzûn

Ket qelbê wî bê 'eded quesawet
Hat ser wî ji hed ziyade zehmet

Herçî ku hebûn meriv li dû wî
Bê hed kirine teselî bo wî.

Mecnûnî dî, nîne çarekarî
Bo Newfelî kir du'a û zarî:

*Bo yek wekî min cunûnê meşreb
Ewçendî te dî eziyet û te 'b*

*Ew zewq û sefa û keyf û seyran
Hindî me dikir li çol û sehran*

*Da terk, û me da te î tûmadim
Dîsa nebû hasil muradim*

*Ew Êla ku Leylê tê de sakin
Yekcarî te kir ji bo me duşmin*

*Ger carekê ew li min nezer kin
Xwûna me vexwun, cased bi ker kin.*

Tazî xwe kir ez lîbasê árî
Dîsan kete badî û seharî.

Newfel ku kelamê Qeysî kir gûş
Bê hed ji heyayê bûye xamûş

Pir hate xezeb û hate xîret
Her çendî hebûn ewî eşîret

Qasid wî kirin belav û şandin
Mecmû ê eşîrê xwe civandin

Pir zêdetir ez hîsabê ewil
Wî ordû kirin ji bo xwe kamil

Kir 'erşî bi 'ezmê Êla Leylê
Der rahî diçin bi quesda Eylê

Nageh fikirî ku pêşî, muqabil
Mecnûnê feqîr ê dil tîjî kul

Newfel ku li Qeysî kirye gazî:
Her tu digerrî melûl û tazî?

*Dîsa me ji nû ve kirye esker
Ewçendî ji bo te em dîkin şer*

*Rabe bi me re were, biçin zûd
Hasil bikin em ji bo te meqsûd.*

Mecnûn jî bi wan re bûye tabî'
Taîfeyê Leylê bûne samî'

Heta ku hebû di wan de taqet
Bo eskerî ketne kar û xizmet

Ew jî ji xwe re ketin tedarek
Wan cem î kirin eşîr bi carek.

Ew komê giran ku bûn muqabil
Ser qewxe û şer dibûne mail

Bû herb û serî ji hev pekandin
Wek belgê şecer cesed weşandin

Xweş hatine hev bi tîr û kêbir
Bû şubhetê multeqayê ebur.

Rûniştiye Qeysî nav-i esker
Gazî dike wî Xwedayê ekber

Wek cara ewel ewî rica bû
Bo eskerê Leylê her du'a bû.

Weqtê ku dibûye qewxe û ceng
Mecnûn digirte destê xwe seng

Davête li ser qebîla Newfel
Herçî ku didî di navê meqtel

Wan jê re digotî: *Dînê sewda
Em canî dikan ji bo te efda*

*Ewçendî ji bo te ne 'esakir
Mal û ruh û can me giş fida kir*

*Em bo te dikin qîtal û herban
Dîsa tu didî li me bi derban.*

Mecnûn weh dibû ji wan re qail
Bo eskerê Leylê bûne qatil:

*Hûn daxî dikin dilê min ê kul
Îmkan e ku ez bikim tehmul?*

*Her yek ji ewan ji can e çêtir
Cumle ji ruhê min ew di bêtir.*

Weqtê ku wuha digo xeberdan
Bîl cumle diman li Qeysî heyran

Bê hed û qiyasî bûne harib
Medrûbî hinik, hinik di darib

Ew herdu teref li qetlê talib
Newfel bû li ser ewan ê xalib

Taîfeya Leylê hat emanê
Newfel kubihîst emanî danê.

Hat babê ewê û çendî e yan
Bo Newfelî bûne destîdaman

Go: *Padîgehê xwedanê şewket*
Ev qewxe û herb ê bû du newbet

*Ewçendî telef kîrin me însan
Em herdu qebîle bûn perîsan*

*Ger quesdi ew e keçê dixwazi
Emrê te ye her çewan bixwazi*

*Leylê bikim ez ji bo te hazir
Carek li cemala wê be nazir*

*Eqlê te di xayeta kermalê
Erbab e eger ne bê fesal e*

*Reya te binê çewan hilanî
Fermana te ye, tu her dizanî*

*Ev dînê wuha li pêşê çava
Çawa bikim ez ji bo xwe zava?*

*Her dê bikenin li ser me însan
Te yîbê bikin me ehl û cîran!*

*Îlla ku dibêjî dê bidî tu
Axir ew e ser me amir î tu!*

*Newfel fikirî ku vê keça pak
Çawa bide dînekî cîgerçak?*

*Go: Ger bikim ez vî işî tertîb
Mexlûq ê hemî bikin me te'yîb*

*Hasil ew e nakim ez tedarek
'Uzrê te me kir qebûlî carek*

*Herçî te qisûrê kir ser û bin
Mecmû î hemî 'efû kirin min*

*Axir ji nuha û bi şûnde daîm
Ed'îyye ê te ji min re lazim.*

Bo Newfel wî gelek du'a kir
Newfel jî ji wî dixwestî xatir.

Newfel ku berê xwe daye malan
Mecnûn ku bihîstî, bûye nalan

Çû gote ji Newfelî re Mecnûn:
Kan soz û qerarê ku te dabûn?

Sed heyf li qerarê nabî sahib!
Te digo ku "bibim li ser wî xalib

Ez dê te bikim bi Leylê wasil
Meqsûdê bikim ji bo te hasil

Du car e ku têm huzûrê samî
'Ehdê te wuha ne her mudamî?

Dax dan te li ser dilê min ê kul
Bo gotinê xwe tu nabî qabil.

Newfel bi wî ketye halê hîret
Bo Qeysî kirin gelek ji şîret:

Ez Leyla ziyade husn û dîdar
Bînim ji te re bi soz û iqrar.

Ket çol û meşî nekir ewî gûş
Ez derdê fîraqê bûye medhûş

Newfel ku di pê ve çendî însan
Şand û qe nedî tu nam û nîşan.

**BENDA HEŞTA
SÎKAYETA LEYLÊ JI FELEKÊ
Û DÎNA MECNÛN SEYAD**

Newfel ku ji boyî Qeysê pirderd
Leşker kire kom û zehf û bêhed

Da ew biçe şerê babê Leyla
Leylê kubihistî bûye dilşa

Pir hemd û şukur ji boyî Rehman
Wê kir ku bihîstî ev xeberdan:

*Babê me qet bi şer û esker
Nabe ji bo Newfelî beraber*

*Dê min bide boyî Qeysê bêzar
Melhem bike vî dilê birîndar.*

Ev mebhese her xiyala wê bû
Daím ewê çeşmî her li rê bû

Heta ku kişandî komê esker
Dunya kirî şubhê rûzî meşer

Xwestin ji Xweda niyaz û metlûb:
Newfel bikî xalib û me mexlûb!

Leylê bi du'a weh bûye meşxûl
Ed'îyeyê wê nebûne meqbûl

Newfel şikiya, nebû muqawim
Leylê bû di behra xem de qaim

Kir şîn û ji nû ve ketye me`tem
Ser wê civiyane eskerê xem

Go: *Ey feleka hesûd û dewar*
Yarê te tune ji bo dilê jar

Ew xunçeyê ku muradê Mecnûn
Dembeste bûye nuha ew eknûn

Weqtê vebûna ew ji nageh
Tu bûyî bi macerayê ageh?

Pir dî te ji boyî Leylê Mecnûn
Şa kir li me ew qerîbê mel'ûn

Te daye me herduyan hezînî
Qismê di 'usqaqlî nahebînî.

Leylê kete nava narê hesret
Umêdê birrî ji bax û weslet

Dewrek wuhe her melûl û giryân
Der şam û seher bi ah û efxan.

Heta weku bûye cara sanî
Newfel kirî esker û giranî

Leylê kubihistî behsa esker
Bû şubhetê bedrekî munewer

Dêmê xwe temîz dikirye ez dil
Çeşmê di belek tijî dikir ez kil:

*Ya Reb tu Xwedayê la yezal î
Bo Newfeli tu bikî hevalî.*

Geh-geh bi sirûr û geh girî bû
Der şahî û huznê heyirî bû

Heta ku ewê xeber hilanî
Newfel ku bi wan re sulhê danî

Yekcarî nema umîd û weslet
Eşkan qe nedaye çesmî muhlet

Perwanesîfet di narê firqet
Sebr û dil û canî kefte hirqet

Ez wesleta Qeysî maye meyûs
Der hebsa fîraqê maye mehbûs

Rûniştî digel xemanê mehzûn
Bê yar û heval ji derdê Mecnûn.

*

Mecnûn jî nedî tu 'îzz û îclal
Dewran qe nekir bi wî re îqbal

Weqtê şikiyayî dil ji Newfel
Derdê wî ji nû ve bû mukemel

Ket çol û çiya ji derd û êşan
Ez firqeta yarê bû perîşan

Leyla ye li ser zebanî ewrad
Her weqtî ji ber xeman dike dad

Dewarî bûye li çol û wadî
Nageh bû leqayê yek seyadî

Sê ferkê xezalê kirye nêçîr
Mecnûnî ku dî, dimaye êsîr

Weqtê ku dî ew xezal û ceyran
Mecnûn sekînî ji pêş ve heyran

Hêstir dikişin ji çeşmê ahû
Der destê Seyad dikêşe yahû

Seyadî dibêje bo xwe ev qal:
Hersê wehe saxî nagihin mal

Ser dê bibirim ji hersê karan
Dê bar ê bikim li ser dewaran

Dû heb bidim ez bi pare sade
Yek jî ji xwe re bikin zewade.

Mecnûn fekirî li hersê ferxan
Fîl halî ji işqê hate çerxan

Wî bo xwe xeyalê kir di hazir:
Tesbîhê bi van e Leylê nadir

*Babê wê li mal kirî giriftar
Hêstir bi mîsalê durr ê şehwar*

*Ez hesreta hicrê her dirêje
Eş'arî ji bo xwe re dibêje:*

*"Ey hicrê, tu nîne te nîhayet?
Bo aşiqî nakî qet rî'ayet?"*

*Carek bike min bi weslê dilşad
Ez qeyda fîraqê bike azad."*

Mecnûn ku wuha wî kir tesewur
Ket wechê wî ez hicrê texeyur

Eşkê wî misala tavê baran
Barîn ji xiyalê derdê yaran.

Seyadî li halê wî teheyur
Bê hed wî li Qeysî kir tefekur

Mecnûn ji wî kir rica hezar car:
Tu van bide xatirê min ê jar.

Seyadî ji wî re kir tekelum:
Tu pir merivek xwedanterehum

*Lakin me gelek îza û zehmet
Dîtin, me bi wan re pir meşeget*

*Heta ku me ev xezal kirin seyd
Min bo xwe kirine hersê der qeyd*

*Hindek bifiroşim ez xezalan
Hindek bixwim ez digel 'eyalan.*

Mecnûnî ji wî re gotî ixbar:
Van çeşmê siyah û husnê dîdar

Sed heyf e bidî ji wan re zehmet
Bo van xwesikan mede tu ezyet

Wellahî eger evan xezalan
Serjê kî, yeqîn diçim bi talan

Mewla dihebînî ey Seyadî
Van çavê reşan çira tu nadî?

Seyadî ji Qeys re kirye gotin:
Reşçavî ne lazim in ji bo min

Bo xatirê te eger riha kim
Nefqatê 'eyalî peyde nakim.

Mecnûnî hinik ji cil û sewban
Mabûn û dikir wî tê de dewran:

Eswabê di min ji bo xwe bistîn
Berde tu evan xezalê mîskîn.

Seyad fekirî li sewb û libsê
Zêdetir in ew ji ferxê hersê

Xizlan û libis bi hev bedel kir *
Berdan û revîn bi şadî xatir.

Mecnûn jî ji keyfa wan xezalan
Mesrûr kete wadî û newalan

* *Xizlan*: Piraniya xezal e.

Ew her digerre bi ferh û şayî
Bo hersê xezal ku kir rihayî

Nageh bû lîqa seyadê axir
Wî girtiye bo xwe yek kebûtir

Mecnûnî ku dî ji işqaê Leyla
Çû bûse sitend ji çêşmê şehla

Kir ah û girî ji bo kebûter
Şeq bû dil, wî cîger dibû ker

Go: *Hêvî dikim ji te Seyadî*
Azadî bikî di rahê Hadî.

Vî jî wekî seyadê pêşî
Go: *Hinde fîxanê tu dikêşî*

Zanim ku dixwazî tu rihayê
Lê xeyrî kesib ji dest me nayê

Her seyd e ji min re kar û sen'et
Qet nayê ji min tu iş û xizmet

Dev berde ji min, nesim riha kim
Çawa vê eziyetê heba kim?

Mecnûn wehe gote wî xeberdan:
Îsev ku li te bibime mihvan

*îlla dikî bo me şîv û xwarin **
Bîl cumle Ereb wuha biwarin

* *îlla dikî* , di destnivîsê de "dikû" hatiye nivîsandin.

*Berde tu evê bike rî'ayet
Sankî te ji min re kir ziyafer.*

*Dîsa yekî şubhetê te seyad
Wî girtibû sê xezalê newzad*

*Herçî me hebû ji cil û libsan
Bîl cumle me dan û hersê berdan*

*Ez mame niha ji libsî 'uryan
Îlla heye cildê min li ser can*

*Ger razî dibî, bidim te ez can
Min bo wê bike fida û qurban.*

*Seyad heyirî li macerayê
Berdabû firî kete hewayê*

*Mecnûn ku dî kir kevokê perwaz
Wî jî bi fixanê kirye axaz*

*Işqê kire şubhetê kerengperr
Ket çol û çiya bi fetl û hem gerr*

*Wî eşkî dizên bi şubhetê av
Canê wî nekir tehemula tav.*

*Wî kirye nezer li pêş xwe carek
Dî yek şecerek gelek mubarek*

*Lakin ku di zzila wê muquerer
Hewzek bi mîslê Hewzî Kewser*

*Maê wê mîsalê engebîn bû
Ewçendî bi lezet û şêrîn bû*

Qeysê ku ji rehtiyê nema hoş
Ew maê lezîzî kirye wî noş

Rûniştî di zzila ew şecer da
Nageh wî li jora darê nezer da

Wî dîtî li ser wê dara 'ulya
Rûniştîye yek xuraba sewda

Go: *Ey bi mîsalê miskê canan!*
Rengê te res e ji biskê canan!

Aya eceba bi vî siyahî
Dewrankerê 'ebdê kîje şah î?

Yane tu jî şubhê min di firqet?
Wesla te jî maye ta qiyamet?

Yaxud feleka muqîmî dewar
Subha te kirî bi şubhê êvar?

Lew te bi mîsalê zulf û purçem
Wergirtiye her lîbasê me `tem

Elbete heye ji bo te yek sir
Nabî tu bi macerayê muxbir.

Nageh fikirî ku ixtiyarek
Zencîr kiriye wî bextiyarek

Nezdîkî ku bûn li Qeysê bêhal
Pirsî wî ji ixtiyarî ehwal:

Bo çi te kirî xwedanmelalet?
Sûcê wî çi ye? Çi ye qebahet?

Merdê ku hebû di 'unqê zencîr
Go: Ketme ji hal û nîne tedbîr

*Min nîne mecalâ sen'et û kar
Ev kal jî ji min ziyade naçar*

*Min xwe kirye miyanê zencîr
Gotin ew e her dibêje êsîr*

*Der êl û qebîle bûne dair
În'am ku dikin li me eşair*

*Herçî ku dikin ji bo me îhsan
Du behre dikin bi şubhê îxwan.*

Mecnûnê ku ez fîraqê pir derd
Wî kirye rica ji Kalî bêhed:

*Min têxe li dewsa wî feqîrî
Çend sal e ku min diye esîrî*

*Ez musteheq im ji boyî zencîr
Işqê kirime bi derdî êsîr*

*Pir dewarî kirim ji halê dergah
Dûr im ji huzûra yara çun mah*

*Hindî digerî li nava eşîrê
Bêje ku "vî pir diye esîrî*

*Yek hakimekî ku zulm e sun'et
Êsîr kiriye bi xeyrî qebhet*

*Avêtiye nava hebs û zîndan
Ew hebsa ku îsmê wê ye hîcra*

*Çend sal e wuha muqîmî mehbûs
Daîm wuhe ez wîsalê meyûs*

*Pir dîniye wî cefa û zehmet
Vêgav li wî curmî kirye minet*

*Curma wî pir e, tu ne wî taqet
Ew her digere li nik 'enayet*

*Herçî ku bidin ji boyî Barî
Derxin wî ji dest wî zulmikarî." **

*Hindî ku berev' bikî tu pare
Bil cumle ji bo te min supare.*

Kalo ku wuha bihîstî tedbîr
Fil hal kire ustuyê wî zencîr

*Çend rojî wusa gerrîn li eyla
Nageh bû lîqayê Eylê Leyla*

*Leylê ku bihîstî dengî ez dûr
Zanî ku sedayê Qeysê mehcûr.*

*Mecnûn fikirî li bisk û xalan
Wî xwendî wereq di erzîhalan*

*Go: Ey şeha nazenîn û dildar
Bes zulmê ke ber feqîrê bêzar*

*Carek nezerek bike bi rehmet
Çend sal e te kir me narê hesret*

* Amac ji hakîmê ku zulm li Mecnûn kiriye, Leylê ye. Lê pronom wê nêr hatiye nivîsandin..

*Zulfeyn te kirin 'unuq çu zencîr
Sewda dikirim, melûl û êsîr*

*Ev dil wuhe laleweş bi dax e
Perwane ye, wechê te çirax e*

*Destbesteyê emrê padîşah im
Ger çendî ku zêde pirgunah im*

*Lakin mededa me kîsûyê yar
Bo min bibitin demek ricadar*

*Tîrsim ku di weqtê qewxe û ser
Newfel kişande ser we esker*

*Te dil şikiya be ez minê zar
Ez hatime ber deriyê dildar*

*Ger qetil bikî minê cîgerxwûn
Mesrûrî dibim ziyade memnûn*

*Pir bo me dibe se 'adet û i'lan
Ber qapiyê xwe bikî me qurban.*

*Bê hed wî ricayê ateşin kir
Ez hesreta yara nazenîn kir*

*Wî dil keliya û hate coşê
Kir ah û fixan, û da xuroşê*

*Behra dilî pêlê da kenar e
Zencîra xwe wî kir pare-pare*

*Wî rast-i berê xwe da çiyayî
Kalo ku dî halê bênewayî*

*Gotê ku: Tu xewfê nakî ez Reb
Ewçendî me dî eziyet û te 'b?*

*Zencîrê me çêkirî, gi feyde
Heqê wê nekir me bo xwe peyde*

*Ev hinde eziyetê ku min xwar
Axir te kirim melûl û naçar.*

*Wî her wuhe kir li Qeysî gazî
Qeys kefte çiya bi şubhê bazî*

*Leylê fekirî li halê Mecnûn
Kir ah û rişa sirikkê pirxwûn*

*Leylê weh ji Kalî re xeber da
Go: Qet mekeve tu êş û derda*

*Ev aşiq e, nabe zebtê zencîr
Rûhê wî bûye bi işqê texmîr*

*Leylayê hinek pere deranîn
Anîn û li pêşê Kalî danîn*

*Go: Ha ji te re buhayê zencîr.
Leylê qe nekir ji wî re teqsîr*

*Bo Leylê ewî gelek du á kir
Derkeft û ji Leylê xwestî xatir.*

**BENDA NEHA
DI BEYANA DAWETA LEYLÊ
Û IBNU SELAM DA**

Seh kir me ji rawiyê xeberdar
Ev lefzê semîn çu durrê şehwar

Go: Leylê ku daye şuhretê 'am
Husna wê bi şubhê bedrekê tam

Her kes ji wîsala baxê dildar
Muştaq e şebîhê bulbulê zar

Teşbîhê çiraxekê şeva tar
Deynî tu li yek newala pirdar

Perwane çiqas li dor çirayê
Têñ xwe dixin ateşê hewayê

Ewçendî li Leylê muşterî bûn.
Lewra ku mîsalî kes nedîbûn

Ez çar-i teref bi şubhê seylê
Mal erzî ji boyî babê Leylê

Îbnu Selam ev xeberbihistî
Agir kete ruh û can û hestî

Dîn bû, eqil nema û ne hûş
Ku xwestina Leylê wî kire gûş

Go: *Ger Wuhe ez sukût bimînim*
Leylê dê ji destê xwe derînim.

Herçî ku berê qelen birrî bûn
Wî cumle tedarekê xwe dîbûn

Ez cumleyê espî yek hezar bûn
Bîl cumle bi zînê ne lîdar bûn ?

Espê di kihêl û rexşê tazî *
Misrî û Iraqî û Hicazî

Anîne hezarî koleyê Hind
Hem mislê ewan ji cariyê rind

Yek elfî ji naqe wan deranîn
Bar cumle nebat û qendî d'anîn

Anîne hezarî tebleyê mişk
Sed bar ji cewherê terr û xişk

* Nivîskar, behsa nextê ku dane bavê Leylê dike: *Ibnu Selam hezar hespên di şûfê yê Rostemê Zal Rexşê Belek de digel hewqas sûr, hezar koleyên Hindî, hezar cariye, hezar deve, hezar elb misk û hezar bar cewher hemû dane bavê Leylê.*

Bîl cumle ewî kirin muheya
Hindek ji 'eyaneyê di 'ulya

Ew keftine di rahî şubhê bazan
Ba nay û newa û tebl û sazan

Heta ku gihiştine Qebîlê
Çûn ber derê kon ê babê Leylê

Rûniştin ew bi keyf û suhbet
Heta ku ji rahê bûne rahet

Van cumle ekabirê serefraz
Wan kirne bi qiseta xwe axaz

Wan gotî ji wî re: *Ey dilara*
We'da ku te dabû boyî ma ra

Em hatine hem bi emrê Xeffar
Ba qewlê Resûlê heq ê Cebbar

Leylê li Îbnu Selam nîkah kin
Herdu melekan bi hev mubah kin.

Weqtê ku temamî kirin teqrîr
Xaliq jî weh kirbû emr û teqdîr

Ev herdu kirin li hev ewan 'eqd
Mehra wê li ser hezar zêrê neqd

Fatîhe li ser vê 'eqdê xwendin
Qenc mehr û nîkahâ wan dibendin

Ew ketne tedareka cîhazan.
Leylê kubihîstî dengê sazan

Pirsî: *Çi hewal e, ev ci deng e?*
Çi nay û seda û ev ci ceng e?

Gotine ji wê re: *Ey nîkunam*
Babê te tu daye Îbnu Selam.

Leylê ku bû ew bi behsê agah
Ket behra firaqê, kir ji dil ah!

Go: *Vî pederê min ê cefakar*
Îqbala me xiste dewsê idbar

Ez dame evî niurovê napak
Dûr keftime ez ji Qeysê xemnak.

Hêstir dirrijîne her demadem
Hê nû kete ew lîbasê matem

Her lehze dikir wê ah û feryad:
Ez destê felek ewê dikir dad

Hasil ewê halî her wuha bû
Qet taqet û sebra wê nemabû

Bû dawet û bû sefa û bû coş
Bû saz û seda û cunbiş û dos

Qet meylî tune li dengê sazan
Ne meylî newayê reqsîbazan

Hatin ji nû qîzê wê Qebîlê
Tebrîkê dikan ji boyî Leylê

Qet nake ji wan re îltifatek
Wê nîne di cismî de heyatek

Anîn zer û zîv û hem cewahir
Mecmû ï kirin li Leylê nadir

Ew kirne mehafeyek musenne
Bîl cumle bi cewheran muresse

Hindek ji cewariyê di nadir
Mecmû ï bi Leylê re teba kir

Ket rah û meşîn bi fexr û bazî
Lê dan li dufûf û tebl û sazî

Mizgîn çû ji boyî Îbnu Selam
Da mujdeçîyan zêde ïn'am

Leylê ku nuzûlê kir li xane
Wek bedrî li nav-i asîman e

Anîn ji tîbaqê pir cewahir
Bîl cumle li ser serî bela kir

Hindî ku li ser serî rîjî bûn
Miskînê Qebîle têk xenî bûn

Mîn be'dî, li ser sebîlê 'ade
Danîne te'am ji hedê ziyade

Xurşîd ku fîraqê Meşriq kir
Çû seyrê li baxê meddrib kir

Weqtê ku li rahê Xerbê 'azim
Leylê di meqamê wê de qaim

Der gulşenê Xerbê rojî bû xerq
Leylê ji nû kir tulû ï ez Şerq

Leylê ku bû serserînê tali'
Tîrêjê li cîhan kirne şai'

Lem'e ku kişîn ji wechê Leylê
Kir Îbnu Selam bi bal ve meyлê

Herçî ku hebûn ji xasê hezret
Wan dî ku Îbnu Selam di herqet

Çun kirne herem ji xelqê xalî
Ma Leylê li ser serîrê 'alî

Zava çû tewafa "Beytî Me'mûr"
Beyta weku der hîcabê mestûr

Weqtê ku hilat ji wechî berqe'
Ez wechî çû lem'eyek muşe'se'

Zava ku nerî li qed û dîdar
Wî eqlî çû, ket, bi şubhê murdar

Weqtê ku Binu Selam kete erd
Hatin civiyan cewarî û 'ebd

Anîn û gulabê lê reşandin
Mirwahê li wechê wî weşandin

Ba elfî helake bûye aqil
Dîsa li cemala Leylê mail

Hasil ku nema li eqlî dehşet
Çû bal ve û kir umîda weslet.

Leylê dî ku kir bi bal ve teqdîm
Ateş rijiya ji femmê çun- "mîm"

Leyla xeyidî bi wechê texyîr
Bê hed kiriye ji wî re te'zîr

Ewqas xeberê di pîsî gotin
Pê cergê Îbnu Selamî disotin

Leylê ku kirin ji wî re duşnam
Bo wê wehe gotî Îbnu Selam

Go: *Bo te bibim fîda û qurban*
Bo çî te kirim wuha perîsan?

Weqtê ku wî kir wuha tekelum
Leylê weh bi wî re kir terenum

Go: *Ey ser û serwerê qebail*
Zanim qe nehin wekî te kamil

Ewsafê te zû kirin me dergûş
Alem hemî cumleten ji te xwûş

Tu lutfê ke, guh bidêre ser me
Bêjîm ji te ra heçî li ber me:

Weqtê ku ketim di nava mekteb
Hindî ku me dî eziyet û te'b

Yek merdekî pir bi husn û dîdar
Nageh xwe li min ewî kir îzhar

Min zanî ku ew ji cinîzad e
Meyla ewî bû li min ziyade

Tu zanibî ev xeber bi tehqîq
Yek lehze ji min qe nabe tefrîq

*Tu dûr be ji min eger dizanî
Fil hal te dike bi derbê fanî*

*Qet nabe ji min re çareyê kar
Heya pederê me bûye bêzar*

*Ev derdî nebû belavî hergiz?
Walîde û babî mane 'aciz*

*Hala bi mi re bûye muqabil
Nageh dike bo te bibe qatil*

*Min hêvî ew e bikî tehemu
Tu her bidî ser Xweda tewekul*

*Derman tu teleb bikî ji bo min
Belkî bikî çarekê ji bo min.*

*Pirsê bike ez murovê fazil
Belkî bibe meqseda te hasil.*

*Leylê wehe bo wî kir beyanî:
Cinî ye ewî sehîh dizanî.*

*Bû Îbnu Selam melûl û nalan
Weslet reviya û ket mitalan*

*Êdî wî nema bi bal ve meylê
Qet wî nezerek neda li Leylê*

*Her mabû ji bo 'ilacê qaîm
Wî pirsê dikir li çare daîm.*

**BENDA DEHA
ÇÜNA ZEYD NIK MECNÛN
Û BIRINA MEKTÛBA WÎ
Û CEWABANÎNA JI LEYLAYÊ**

Sahibxeberê fisane perdaz
Wî kir bi vî terzî qise axaz

Gotî: Hebû yek nedîmê nadir
Zeyd bû ewî nav, bi  ehdê Qadir

Meşhûr bû bi fedl û hem kemalê
Me'rûf bû bi husn û hem cemalê

Pir dîtibû wî cefa û muhnet
Kêşabû bela û te'b û hicret

Ew aşiqê mutbela yê mehzûn
Her dem hebû meyla wî li Mecnûn

Weqtê bû bi qisetê xeberdar
Leylê bûye bûk, Zeydî kir kar

Pêşîr bû ji hêstirê di xwûn al
Kir qesdê li Qeysî çûye fil hal

Hîna ku çû ew gehîste Mecnûn
Mecnûn ku dî, Zeydî zar e, mehzûn

Pirsî ji wî: *Ey nedîm û yar im*
Der qafilê xem de xemkar im

Qet nîne te iro îxtilatek
Ne keyfû ne suhbet û nişatek

Çawa bû ji te, tu hinde bû zar?
Bê sebr û sukün-i bûyî naçar?

Derket ji dihanê Zeydî ateş
Wî gotî ji Qeys re: *Ey belakes*

Bû dujmunê te ji nû ve dewran
Rakiriye ji bo serê te dewran

Dewra feleka fuzûl û bê'ar
Ew bûye ji bo Binu selam yar!

Leylê bûye yar ji boyî xeyran
Hêja digerrî melûl û heyran

Dayî' ji te re fixan û ev ah
Sûzî şeb û ahê der sehergah.

Mecnûn ku bû ew bi qisetê agah
Esman şewitî ji şûleyê ah!

Nalîn kete, bo wî, mar û mûran
Kalîn kete wehş û hem tuyûran

Leb kaxez û kir zebanê xame
Bo yar nivîsand îtabê name: *

Sernameyê Name, namê Xaliq
Xefar û Xweda û heyy û raziq

Çêkiriye cîhan bi esl û bunyad
Alem hemî ez 'edem kir îcad

Paş hemd û tehiyyet û selatan
Ya Reb bikî hellê müşkilatan

Ev name ji vî cefakeşê zar
Sergeşte û mubtela û naçar

Bîghê ewê dîlbera ku bê 'ehd
Ku daye cefa muhibbî pir cehd;

Ey nîne wefa û 'ehda te yar!
Bo xeyrê me gul, ji bo me bû xar!

Dil naşewitî bi halê zarim
Ev çende enîn û ah û zar im

Aya çiye? Ev çi bêwefayî
Ba xeyrê me kir te aşunayî?

Te girtiye bo xwe yarekî nû
Ê kevin te jê gerrandiye rû

'Ehda te, me her temam dizanî
'Ehdê te nebûn, me qet nizanî

* Bi nameya ku Mecnûn ji Leylê re dijîne, rexne dike û
Leylê di sozê evîna xwe de tawanbar dike.

*"Her weqt te bi min re soz e daîm"
Te dil kiriye bi xeyrê qaîm*

*Zahir tu bi min re dost û hem yar
Batin te ji bo xwe girtî dildar*

*Ez bûm bi te re muqîmî bednam
Carek me nedî ji dil re qet kam.*

*Ey yara ji boyî cismê min can!
Qûtê ruhê min, ddiyaê çesman*

*Tu mihra mûnîr û rux bi nûr î
Nabin bi şebîhê te tu hûrî*

*Ez hinde zeîf û bê kes im ez
Der xar e me mesken û xes im ez*

*Tu bo xwe wuha dibêjî sihbet
Mabeyna min û te nîne nisbet*

*Ez jî ji te re bibim muwafiq
Ez bo te, tu bo me nabî laiq*

*Ez her bi xeyal dibime qani'
Umrê xwe wuha me bir bi ddayi'*

*Tu bo xwe dixwazî laiqê xwe
Qet nabe tu însî manî'ê te*

*Bo te wekî min pir in cîgerxwûn
Tu li kî binerî, dê bite mecnûn*

*Ey çesmeyê abî zendeganî
Her dem di dilê mi de nihan î*

*Yek lehze ji çeşmê min nehî dûr
Çawa te wesil bi xeyr e meqdûr?*

*Qet nedbû te 'uzrê bikra îrsal?
Ba yek xeberek me nakî xweşhal?*

Weqtê ku temam bû se'yê xame
Teslîm kirî boyî Zeydî Name

Zeyd rabû meşî û bû subukperr
Ket rah û firri wekî kebûter

Heta ku gihişte Îl û Eywan
"Çawa bigehime sedrê Dîwan?"

Wî gotî, bi 'ilmê sihr û efsûn
"Zanim weh ji hed ziyade efzûn"

Ta Îbnu Selam xeber hilanî
Rabû û şiyande Zeydî anî

Wî kirye gelek li Zeydî meyîlê
Gotê: *Te bihîstî derdê Leylê?*

Go: *Zanî me derdê Leylî mehbûb*
Ed'îyye hene bi min re mektûb.

Wan anî bi gotinê wî îxlas
Zeyd xistine nîvê xelweta xas

Weqtê ku bû Zeyd bi Leylê wasil
Zanî dibe mexseda wî hasil

Rûnişt û gelek kirine suhbet
Dî meclisê wan ji xeyrî xelwet

Zeyd kiriye qiyam şubhê mestan
Mektûbê deranî daye destan.

Mektûbê ku sitandî Leyla naçar
Ez Name hilanî bûyê dildar *

Weqtê ku li Name wê nezer kir
Ahan di dil û cîger eser kir

Hêstir bi mîsalê hebê mircan
Kêşan ji bîharê çeşmê durrcan

Gava ku dixwendî wê 'îbaret
Zanî hemî me'nî û işaret

Der cergê wê kir 'itabê tesîr
Wê anî cewabê kirye tehrîr

Wê kir bi vî terzî xame carî
Go ewel: *Name namê Barî*

Mî'marê bînaê 'eqdê peywend
Wehhabê 'etaê mal û ferzend

Îzhara wucûdê ez 'edem kir
Îcada hudûsê ez qîdem kir

Ev Name ku ez minê xerîb e
Yanî ku ji Leylî dilkebîb e

Ersalî dibe ji boyî Mecnûn
Mecnûnê ku bû bi işqê meftûn;

* Mana vê nîvmalikê weha ye: *Ji nameyê bîhna dildarê xwe Mecnûn hilanî.*

*Ey xakê bîsatt û xarê puster
Kamê dilê teng û dîdeyê ter*

*Her te'neyê ku bikî li cî me
Lewra ji te rûres im, fedî me*

*Ez mu'terif im ku pir gunah im
Ber qapiyê lutfê 'uzrîxwah im*

*Ez cewher û xelqê bû xerîdar
Nîne bi min ixtiyarê bazar*

*Hebwa ku bi min re ixtiyarek
Qet nedbû ji xeyrî te nû yarek*

*Ger b` Ibnu Selam re dilfurûz im
Şem'ê şeb û afîtabê rûz im*

*Ew dûr be ji min, dibîne tabim
Nezdîk be, dikêşe ew 'ezabim*

*Fîkrê meke, ez nişattîmend im
Der damê xumûmê payîbend im **

*Geh-geh dikim ez fîxan û feryad
Walîde û walîd ez dikim yad*

*Geh wesla te ez dikim tefekur
Halê te ji bo xwe her tesewur*

*Çesmî j'uyûnî dîbin rewane
Xesla bedenê dikim behane ***

* Leylê bi Mecnûnî dide zanîn, ku hêj qîz e û Ibnu Selan neçûye livîna wê.

** Leylê tahfîlkirina xwe behane dike, ne ku heram dibe.

*Tenha ku dibim dikim xwe 'uryan
Mûyê serê xwe dikim perîşan*

*Her dem ji wîsalê bê umîd im
Ba şûrê cefayê ez şehîd im*

*Ez bulbulê baxê firqet im, zar
Emma di qefes de bûm giriftar*

*Yek wehsî ji bo me bûye haval
Çi b'kim ku Xweda weh daye îqbal!*

*Daîm tu jî ba wuhûş î her dem
Hemrengî bûyim ji bo te ez hem*

*Ey 'asîqê mustemendê mehcûr
Hasil bigire me iro me'zûr*

*Sebrê tu bike, dibe ku gerdûn
Van roja bike li me dîger gûn.*

*Name bi vî terzî kirye tekmîl
Da Zeydî, li wî dikirye te'cîl*

*Zeyd rabû meşî, bi Qeysî wasil
Dî durre bi 'eqîqê xwe muqabil*

*Ez Name hilanî kesbê meqsûd
Bê hed bû ji alî Leylê xweşnud.*

BENDA YAZDA
ÇÜNA BAVÊ MECNÛN CEM WÎ
Û ŞİRETKIRINA LI WÎ Û CEWABDA-
NA MECNÛN

Tehrîrê kunanî ehlê înşa
Kêsa bi vî terzî xetê tuxra

Go: Qeysî ku kefte êş û derda
Babê wî nemabû hiş di ser da

Hindî ji xezîne û ji emwal
Pir bûn-i li nik wî, ma kerr û lal

Her wî ji xwe re dikir tefekur:
Çi b`kim bi vî malê xalib û pur

*Nîne me weled ji xeyrî Mecnûn
Ew jî weh bi işqê bûye meftûn*

*Pîr im, dimirim, me ev yeqîn e
Bê sahib e hem mal û xezîne*

*Zanim dimirim, dimîne ev mal
Exyarî bixwun vî malî her hal*

*Ya qenc ew e, ez herim bibînim
Belkî ku ewî digel xwe bînim.*

Rabû û bi wî re çend heval çûn
Ew jî ku bi hatina wî şâ bûn

Çendan geriyan li kûh û hamûn
Qet yek eserek nedîn ji Mecnûn

Nagahî ku dî wî yek zilamek
Çû pêş ve û lê kirî selamek

Go: *Xizr î ji min re hem tu rehber
Ma nedye te Qeysê wehşî hemser?*

Go: *Wa ye le ber derê muxarê
Manendî durrî di nav xubarê.*

Meşya û lezî heta gihiştê
Dî sengî li ber serî û puştê.

Mecnûnî ku dî ewî bi çava
Agir kete nêv dil û hinava

Rûniştî li ber serê birîndar
Hêstir rijiyan ji çehvî sed bar

Destê xwe gihande wî lualî
Ez toz û xubarê kirye xalî.

Çehvê xwe vekir: *Tu kê yî dîsa
Bo min ku nuha dibûyî Îsa?*

"Bavê te me" go ku: *Ey cîgerxwûn
Bes ke tu minê bêçar û mehzûn.*

Weqtê wî tefekir û nezer kir
Agir di dil û cîger eser kir

Rabû xwe gihande singê bavê
Hêstir herikîn bi mislê avê

Bav û kurî herduwan bi hev ra
Giryân û kirin fixan bi hev ra

Der gerdenî yekdîger dû zandan
Pêçane wekî xemê kemendan

Hey-hey giriyan û her dinalîn
Wek berx û miya li hev dikalî

Bûn herdu ku farix ez enînan
Ew mane çu bêkesan û dînan

Bav lê fekirî ku qet li ser can
Libsek tune xeyrî çermê heywan

Anî û heqîb li ber xwe danî
Wî libs û te' amî jê deranî

Derpê û kiras û sol, 'emame
Lê kirne wî yek bi yek temame

Nan danî û xwarin û xeberdan
Go: *Ey weledim, bes e ji derdan*

*Ez hatime da tu bêyî malan
Bes tu bigerrî li pê xezalan*

*Bes ke tu ji seyrî kûh û deşte
Ev xwûn te çi ye ji çehvê reş tê?*

*Weqîe ku cuwan bûyî hebwa bû
Dil te bi cuwaniyê teba bû*

*Tu bûyî di rahê işqê meşhûr
Tu bûyî di wî zemanî me'zûr*

*Her weqtî heye yek emrê xalib
Her 'esrê heye yek îş munasib*

*Hala ku te dî meqamê aqil
Tehsilê kemal re bûyî qabil*

*Eyb in ji ji te-r nîda û ev keser
Nabin ji te re hewayê serser*

*Dîn bûyî, niha bibe tu aqil
Der çol û çiya meger tu xafil*

*Tu bûyî digel wuhûşî ehbab
Nahêlî li xwe tu libs û esbab*

*Nabînî tu her wuhûş û her teyr
Her yek bi refê xwe re dike seyr?*

*Rehmek tu bike li ser minê zar
Derxe me ji vê bela û efkar*

*'Umrê me ewa gihaye axir
Rûnê tu bi 'izz û hem tefaxir*

*Teslîm bikim bo te mal û emlak
Rûnê tu li cayê minferehnak*

*Ey butkedeê sənemperistî
Ger rabe ji te hîcabî mestî*

*Bê bîrî te ev hewa û halet
Elbete digîje te xecalet*

*Aşiq tu ji bo cemalî dildar
Bûyî tu bi derdê wê wuha zar*

*Tu bûyî bi van bela giriftar
Ew bûye çirayî bezmî exyar*

*Tu şermê bike ji işqibazî
Faîde tune ji cankudazî*

*Qet nîne wefa ji boyî dewran
Her dem dide yek murovî dewran*

*Tu yar mebe bo zemanî, tehqîq
Yek rojê dikî ji wî tu tefriq*

*Tu terk bike ji xeyrî Barî
Xeyrê wî meke ji kes re zarî*

*Weqt e ku bikim sefer ji dunya
Deynim qedem ez li rahî 'uqba*

*Bo malê xwe min diye gelek renc
Tu bermede destê xeyrî vê kenc **

*Dewran bike başqe iş û halim
Tursim ne bimînim ez, ne malim*

* Bêjeya "kenc" lazimê xwe tê ku "genc" be. Ji ber kû "genc" navê xizne û define ye.

*Tu her weh dimînî bê kes û zar
Êsîr û melûl dimînî naçar.*

Çun we'zê xwe kir wuha temamî
Mecnûn fikirî di wî kelamî

Ew jî bû li pendê babî mail
Da terkê bike, bibîte aqil

Da terk bike arezûyî dildar
Edî nebe ew bi işq giriftar

Ceşmê wî li terkê rahî işqê
Nageh ewî dî ku şahê işqê

Dîsa kire bendeyî di ferman
Qelb û dil û ten dihate lerzan

Qelbê wî kelî û dil bi hoş hat
Nagah bi gazî û xuroş hat

Go: *Ey puderî min ê xiredmend
Her çendî li min kirin te ev pend*

*Ev we'zê te bo me xeyr e, ne şer
Ger bo me be sehkirin muyeser*

*Herçî ku te kir ji bo me teqrîr
Cumle mebihîst û kirye ez bîr*

*Gazin tu meke, neku bidist im
Ez badeî camî işqê mest im*

*İşq girtiye derive û derûnim
Berbad kirî sebr û hem sukûnim*

*Weqtê ku dibim li 'eqlî bai'
Sewdaserim dibîte manî'*

*Sen qanden û terkî işqî qanden
Işqî ezeli çikar mi canden? **

*Der damî hewayê bûme ez bend
Derdê me dibe ziyade ba pend*

*Sûşa ku şikest bû pare, pare
Bo cebî wê qet dibe tu çare?*

*Bo çi me dikî li malê tekîf
Lewra ku dike mirin me texfîf?*

*Ferz ke ku ji mal re bûme walî
Çûm, dîse dimîne malî xalî.*

*Wî 'uzrê xwe xwestî ba dused ah
Şerha xemê kir temamî nagah*

*Babê xwe dixiste nêv teheyur
Mecnûn go: Meke tu qet tefekur*

*Weqtê weku bûm bi işqê serxwes
Bûn yek ruh, û em di navê du leş*

*Mehsûb meke ew ew e, û men men
Yek can bûyî, canê zende du ten.*

*Babê wî ku bûye waqifê hal
Bêçare, nemane qîl û ne qal*

* Ev malik bi tırkıya nû weha ye: "Sen kandin ve işkin
terki kandin. Ezeli işk çikar mi candan?"

Wî zanî ku nabe neqşî batil
Ev işq bit û hîle nabe zail

Wî zanî ku pendê ber, hewa bûn
Kir wesyetê xwe ji boyî Mecnûn:

*Ey rîsteê gewherê muradim
Ayîneî husnî i'tîqadim*

*Carek tu bike li min terehum
Gotin ji te re bikim tekelum;*

*Saxî me nedî ji te tu rahet
Guh de ku ji bo te kim hikayet*

*Lakin were, ji te dikim ricayê
Weqtê bimirim biçim fenayê*

*Ser min bigirî tu şîn û me`tem
Pir bîne sirikk ji çesmê purnem*

*Ber qebrî mi re bi rehbuwarî
Weqtê dimesî bikî tu zarî*

*Ser adetê xwe bikêşî nale
Wî ecrî ji min re kî hewale*

*Feryad û fîxan bikêşî ez dil
Weqtê bi qebir dibî muqabil*

*Da cumleê dost û yar û dujmin
Fehm kin ku heyî tu warisê min.*

*Weqtê ku temam-i kir wesiyet
Ket cergê wî bêqiyasî hirqet*

Ez hesretî Qeysê dilperîşan
Bû zar û zelîl û çeşmîgiryan

Kir ah û fixan ji qelbê purnar
Ax da, li ser xwe kirye hawar.

Mecnûn şewitî cîger bi babê
Ew jî gevîzi li nav turabê

Hêstir kişiyan ji wan 'uyûnan
Teşbîhê bi kanî û 'uyûnan *

Bû şînî li nav çiya û sehra
Bo wan giriyane hûtê behra

Her carê ku ew didin fixanan
Ateş digihîje asîmanan

Hindî ku kişandin ah û hesret
Bo wan hezinîn horê cennet

Her çendî ku ew dibûne gîryan
Qudsî dibûne li 'Erşî buryan

Weqtê ku wîda ê kir ji Mecnûn
Dîsa rijiyan sîrîşkê purxwûn

Axir nebû çare ba tu halî
Wî xwestî ji Qeysê xwe helalî

Naçar û feqîrî hate malan
Heta bi mirin bi ah û nalan

* Di rêza pêşî de "uyûnan" çav in. Di rêza paşî de jî ew bêje, kanî ne.

Derd û eleman dikirye rencûr
Der şem'ê heyatê wî nema nûr

Bo derdê xwe qet nedî tu derman
"Mecnûnî" digot û daye wî can.

Nabe bi cîhanê piştgirêdan
Xane li meriv dikîte wêran

Nabe ji tu kes re mulk û emlak
Îlla dide me du gav ez xak

Çendan tu bikêşî te 'b û ezyet
Peyda bikî bo xwe mal û dewlet

Bo te qe tu nîne feydeê mulk
Ez xeyfî rizayê malîk-ul mulk

Tu terkî bike hewayê emwal
Peyda bike bo xwe xeyrê e'mal

Xweşxaneyê 'îş û hoş e 'alem
Çi b`kim ku esasî nîne mehkem

Min hêvî heye ji te eya Reb
Xakî tu nekî bi mal mu'ezzeb

Tu razî bibî ji Xakiyê jar
Bo wî kî şeffî hebîbê Muxtar.

**BENDA DUWAZDA
DI MIRINA BAVÊ MECNÛN DE
Û ZARÎKIRINA MECNÛN**

Yek rojê rijand sîrîşkê purxwûn
Rûniştî li ser çiyayî Mecnûn

Rûniştibû ew muqabil Eylê
Wî bo xwe dikir xiyalê Leylê

Nageh fekirî ku yek ji seyad
Wasil bû bi Qeysî kirye feryad:

*Ey bêkes û bêumîd û me'yûs
Nîne bi te re nîşanê namûs?*

*Saxî qe nekir peder te dîlşad
Barî di mirin de wî bike yad*

*Can da ji mehebeta te babê
Ba ah û keser kete tûrabê*

*Carek bi wî re nebûyî hemdem
Natırsî ji xaliqê xwe yek dem?*

Weqtê ku wuhabihistî Mecnûn
Bû zar û zebûn cîger tijî xwûn

Lê da serê xwe li erd û ehcar
Hêstir kişiyan bi mislê rûbar

Çû pursî li qebrê walidê zar
Ew babê ji boyî wî wefadar

Weqtê ku dî qebrê babê mehcûr
Kir dad û hewar ji qelbê rencûr

Rûniştî li ber serê mezarî
Rû daye li erd û kirye zarî

Wî kirne çiya û çol-i purab
Hêstir kişiyan bi şubhê seylab

Sedrê xwe bi mislê lewhê meqber
Ba naxunê essbu'an dikir ker

Hêj nû bi fixanê kirye me`tem
Wî bo xwe wuha digotî her dem:

*Qet min ji te re nekir xulamî
Heta ku te 'umrî çû temamî*

*Heyfa me nekir tterîq ji bo xwe
Çend rojê nebûm refîq ji bo-te*

*Bo min nebû feyzê te tuyesser
Te xeyr dixwest, min dikir şer*

*Min bo te kirin cefa û ezyet
Carek eme neda ji bo te rahet*

*Weqtê ku dibûm bi xem giriftar
Bo min tu bûyî enîs û xemxwar*

*Çawa bû gelo te kir 'ezîmet?
Ya ne te ji ber me kir hezîmet?*

*Zanim ku gelek gunahîkar im
Bê hed li ber te şermîsar im*

*Min tu di cîhan de pur kîrî zar
Tu min meke der qiyamê naçar.*

Bê hed kire ah û nale ser qebr
Rabû bi çiya ve çû û bêsebr.

Yek rojekê Qeysê dilşikiste
Dewran wî dikir xumar û xeste

Dî yek merivek li ortêî rah
Wî çesmî li destî ket ji nagah

Der destê wî kaxezek mu'etter
Leyla tevî Qeysî lê musewwer

Mecnûn fekirî li herdu sûret
Qenc-i lê fekirî bi çesmê 'ibret

Kir ah û ji ahê wî kişî dûd
Wî sûterê Leylê mehwî kir zûd.

Wî merdî sualê kir ji Mecnûn:
Ey derdîkesê bi işqê meftûn

Bo ci te xwe hişt û Leylê 'hek kir
Nanê xwe ji nû te bê nemek kir?

Mecnûn wuha bo wî cewab da
Gotin wî li sûretê sewab da:

Ez bo te bibêm, bibî tu ageh
Em herdu yek in ji du munezzeh

Nîne ji me ra nîşanê dûî
Dûî ji miyan hilat û çûî

Der mezhebê işq de ci laiq
Me şûqê re her nîqab be aşiq

Aşıqê ten û hebîbê can e
Can her di miyanê ten nihan e

Me şûqê gerek mudam be mestûr
Aşıq bibe nêv cîhan de meshûr.

Gotin wehe kir beyan û ixbar
Fil hal buhûrî û bûye dewwar

Heta weku şemsê her rewan bû
Fî 'eynî 'hemîsutîn nehan bû

Weqtê ku xurûbi kirye agah
Fil halî ji bo xwe kir wekîl mah

Hîna ku dibû li textê qa'id
Katib ji xwe re gerand Etarid

Zehre perîşan dikirye kîsû
Xaib dibû wê di gêsuwan rû

Der çerxê sema Hemel 'eyan bû
Her yek bi meqamekê rewan bû

Ga wê li felek bû, ga wê 'enber
Pur kiribû cîhan ji 'enber terr

Cewza kemera xwe kir muresse'
Gerdûn bedena xwe kir mulemme'

Lê bûbû Esed ji rojê pur dûr
Yekcarî nema di şem'ê wî nûr

Dabû ji bo gîsû sunbule tab
Ser mişkê rijandî 'enberê nab

Mîzanê dikir felek terazû
Serraf ji zemîn kişandî lûlû

Teqreb terikand kemendê purçem
Dêwê siyeh kirye qeydê mehkem

Qewsê xwe kişand supehrê la 'ib
Davêtine tîr-i necmê saqib

Pur xaleê asîman rijand mû
Ser rûyê zemîn kirî siyehrû

Delw û qul kirî afetê di dewran
Sed qittre rijandî rûyê esman

Mehbûs kirî Hûtê Yûnisî roj
Berqa şefeqê bû asîman sûz

Şertîn û bettîn sema ku iklîl
Nûr kirne ji asîman re tehwîl

Bo zînetê wan kirin muheyya
Ez le lê xwe dane der Sureyya

Dabû rewîşî supehrê ezfer
Tertîbê muqeddem û muexxer

Mecnûnî teheyeyur û perîşan
Mabû di işê felek de heyran

Fikrî li felek bi dîdeê ter
Ser rûyê zemîn tijî kir exter

Ewel li sema dibûye mail
Şerh kir bo 'Etaridê xemê dil;

*Ey ehlê hisab re karîferman
Mustewfiyê eql û muşrifê rah **

*Ey nasixê nusxeê me'anî
Fehristê rumûzê asîman î*

*Qessamê meqasid û mettalib
Ressamê menasib û meratib*

*Der dil me hene hîسابê bêhed
Xeyrê te nehin debîri bo derd*

*Yek name ji derdê dil reqem ke
Bo şahê me erzî ke, kerem ke*

* Di malikê de newekhevîtiya qafiyeyan heye. Diyar e ku
di nivîsa bi tîpêن erebî de şâşî çêbûye.

*Belkî bike feyzê xame tesîr
Ev halê cunûn bibîte texyîr.*

*Dî goşî nekir 'Etaridê raz
Bo xwe wuhe kir terennum axaz*

*Wî rû guherand ji wê kirî zaz
Bê hed wî niyazê kirne axaz.*

*Rû daye Merîxê Nehs ê xeddar
Wî kirye wuha ji wê re guftar:*

*Kay waliyê mesnedê şeca'et
Bo şûrê te alem ehlê ta'et*

*Ez 'aciz im û qewî me exyar
Ez bê kes û xess im bo tene yar*

*Bo 'acizi lutfê ke, meded ke
Bo bê kesî tu belayê red ke*

*Sûr derxe, bike tu def'ê dujmin
Da dostî bi min re hemnişîn bin.*

*Ez şûr û qelem dibûye newmîd
Wî girt rehê barîgahê tewhîd*

*Ber dergehê Rebê xwe niyaz kir
Bo Xalîqê xwe wî 'erzî raz kir;*

*Ey ji tîx re mu 'în, ji kilk re rehber
Behramê xulam û tîxê çaker*

*Ey ferqê emel kulahê dûzî
Sahib reqemê beratê rûzî*

*Rehmê bike ber me bênewayî
Derdê dilê min bike dewayî*

*Leylê te kir, ey Xweda, perîwes
Husna wê ku canî daye ates*

*Leylê te kirî belayê alem
Wê ez kirime şikisteê xem*

*Te daye wê husnê aleme frûz
Wê daye min ateşê cîhansûz*

*Te ez kirime bi derdê pur zar
Mecnûn li kû Leylêyî cefakar?*

*Mecnûn te bi derdê muhtela kir
Ba yek nezerek te pur bela kir*

*Ya Reb bi kerem bike 'ilacim
Ez xeyrê bibirr tu ihtiyyacim*

*Ya Reb te kirim bi derd giriftar
Xeyrê te kî ye ji min re xemxwar?*

*Pur bo hukema me gotiye hal
Bo çareê derdî mane ew lal*

*Min zanî hekîmê ferdî tu yî
Danayê cemî'ê derdê tu yî*

*Ger derd û we ger dewa ji bo te
Hakim tu yî bo riza ji bo te*

*Ya Reb bigihîn kemalê zewqim
Roj rojê bike ziyade gewqim*

*Leylayê bikî ji min re zahir
Qet xalî nekî xiyal ji xatir.*

Wî bo xwe wuha dikir munacat
Bo mihnetê xwe dixwest mukafat

Bışkuftî gulê hedîqeyê rûz
Xurşîdê ku da cemalê feyrûz

Murxê demê subh kişandî awaz
Zaxê şebî kir ji nû ve perwaz

Hem sefheê alem bû rewşen
Hem hebê sitêrê bûne xermen

Subhê ji sufa û sidqê zadem
Xweş bûye ji nû nişatê alem

Tesîrê sefayê camî xurşîd
Kir baxê sema bi bezm Cimşîd.

Derkeftibû ser çiyayî Mecnûn
Wî l` reh dinerî bi çeşmê purxwûn

Nageh dî ku hat nedîmê kamil
Hemrazê qedîmî Zeydê fazil

Wî dêm ji nişad tijî bû ez nûr
Zêde bi fereh, bi keyf û mesrûr

Xayet bi sefa û nîne mehzûn
Ev hal xerîbî hat bi Mecnûn

Pursî, go: *Çira bi înbîsat î
Îro tu ziyade ba nişat î?*

*Aya tu bûyî bi dostê wasil
Ev çendî tterebo ji bo te hasil*

*Îro bi ci qedrê serbilind î
Ewqasî tu pir nişattimend î?*

*Zeyd bo wî vekir xezaneê raz
Key turfehumayî ew ci ï'zaz:*

*Do çûme tewafî kûyê Leyla
Da ez bibînim ewê bi tenha*

*El qise, bi wê re bûme hemdem
Ez bûm di herem ji ehlê mehrem*

*Min dî mehî dêmê bê ddiya bû
Ayîneê tel'e bê cîla bû*

*Ne d`le lê leban de qitreyek ab
Ne d'mahê ruxan de zereyek nab*

*Ez dîtim û kirye nale û zar
Wê gotî ji min re: "Ey wefadar*

*Aya eceba bi rehguzarî
Qet çûyî tu nik wî dilfikarî?*

*Mecnûnê me ger te dîtî bîllah
Tu min bigerrîn bi halî agah*

*Aya wî ci hal e der meh û sal?
Kî ye wî refiq, çewa ye ehwal?*

*Bîllah tu here bibîne Mecnûn
Rehmê tu bike li Leylî mehzûn*

*Bo wî ji me şerhê zu'fî hal ke
Halê wî ji ber me ve sual ke*

*Bêje, tu çewa yî nêvê xemder
Der îş û meşiqet û elemder?*

*Weqtê ku me m`tema te seh kir
Min jî kire şîn, lîbasê ker kir*

*Ew serwê ku derketî ji çîmen
Ne ji kîsê te çûye, belkî ez men*

*Pur dî ji me re vê çerxê xeddar
Der cümleê alemî de yek yar*

*Ev zulm e li ser me, aşîkar e
Nayê me ji dest, tu nîne çare*

*Em mane di nêv derdê qaim
Çare ci ye, sebrî bo me lazim*

*Çi b`kim ku muqeyedê hesar im
Mehbûsê hîcabê tengîtar im*

*Nîne ji me re mecalê mektûb
Wasil bikim ez ji boyî mehbûb*

*Wek xunçe me her eza perişan
Ağizim dolu, ah, içim dolu kan! **

*Lê tu şehê kîşwerê riza yî
Çawa tu bibêjî aşunayî?*

* Mana vê nîvmalika bi zimanê tirkî weha ye: *Devê min dagirtî ye, ax! hinavê min jî tije xwîn e.*

*Bo ci eceba dikî tu ihmâl?
Halê dilê xwe tu nakî îrsal?*

*Yek name ji min re nakî tehrîr
Naşînî, wuha dikî tu teqsîr*

*Nînim ji te ez bi êşê razî
Îhsan bikî tu xîlafê mazî*

*Her dem bike tu beyanê ehwal
Şerha ruxê zerd û eşkê xwey al*

*Îrsal tu bike ji bo mina zar
Ez halê te da bibim xeberdar."*

Mecnûn kubihist peyam û mijde
Îqbal ê li bextî bûye 'ewde

*Îqbal e êdî wî î' tîqad kir
Bê hed wî bi Lelê î' tîmad kir*

Dewran bû bi wî re yar û hemdem
Gulzarê ddemîrî bûye xurrem

*Wî gotî ji Zeyd re: Yarê sadiq
Bo min tu yî hemdem û muwafiq*

*Anî te ji min re mujdeê yar
Mesrûrî kirim bi sozê dildar*

*Ez min jî bigîne wê senayan
Erz ke tu durûd û hem du'ayan*

*Bighîne tu xakê der niyaz im
Bo Leylê bike tu erzî razim;*

*"Ey tu yî ji derdê min re derman
Keyfa dile min, cirayê çeşman*

*Elhemd li wahîb-ul 'ettiyye
Mujde te ji min re kir hediye*

*Ez 'ehdê te mi wefa dî axir
Ez şehdê te min şîfa dî axir*

*Min zanî ji bîr nekir me ew mah
Hîna ku dibûm bi mijde agah*

*Karê xweşikan hemî cefa ne
Herçî ji te têñ hemî wefa ne*

*Hindî hene nazenîn û nazik
Qurbanê te bin hemî bi carik*

*Ez naqis im ey emîra 'adil
Lêkin tu di rahê işqê kamil*

*Tehsîn tu yekaneê zeman î
Canim ji te re fîda ku canî*

*Bo her xweşika hebûna ev tewr
Nedbûyî tu her yekane dewr*

*Ev hal bibûna ji wan re meqdûr
Nedbûyî tu der cîhanê meshûr*

*Her dem tu wuha bike me dilşad
Geh, geh tu bi rehmê min bike yad*

*Ey serwî sîmenberî gulendam
Taracê meta'ê sebr û aram*

*Ey Xusrewî kîşwerî melahet
Mehtabê şehî nişatt û rahet*

*Cunkî ku te kir li ser me rehmet
Îzharê te kir ji bo me himet*

*Îcar ku rehê mührê bigir tu
Wek weqtê ewil terîqê megir tu*

*Hesretzede da neçite canim
Rehmê ke bi nale û fixanım*

*Meyla minê bêmefer bike tu
Carna ku li min guzer bike tu*

*Her weqtû tu yî di mesnedê raz
Ez jî wehe her bi derdê demsaz*

*Der mezhebê işqê ev rewa ye
Ev rah û rews gelo wefa ye?*

*Qet Ibnu Selam meke tu manî
Seda rehê wessl meke tu waqi'."*

*Razê dilê xwe ku kirye îxbar
Zeyd rabû û kirye 'ezmê dildar*

*Perwane xeber giha cirayê
Gul mebhesê bulbul gihayê*

*Leyla ku wuha melûl û mehzûn
Bûye bi peyamê ziyade memnûn.*

BENDA SÊZDA
DI MIRINA IBNU SELAM DE
GIHAŞTINA LEYL Ü MECNÛN BI HEV

Xem me temê xwe dikirye bunyad
Newahe wuha dikirye feryad

Ba Ibnu Selam ci kirye gerdûn
Amancê xedengê ah ê Mecnûn

Wî nûresê natuwan demadem
Her dem dikişandî mihnet û xem

Der di xem û hesretê nihanî
Serwîqedê kirye xîzeranî

Her rojê dibû xerabtirê hal
Rûyê xwe ji wî gerrandî îqbal

Bo derdî dewa nebûye peyda
Naxwoş ku şîfa nebûye peyda

Endîşeê 'umrî bûye battil
Can da û bi heqê bûye wassil

Weqtê ku Binu selamî da can
Leylê dikişandî ah û efxan

Leylê ku fixan dikir 'eyan e
Ev waqî'e wê dikir behane!

Ket me`tem û şînê ew giriftar
Her dem dike ah, ew dilefkar

Gêsûyê xwe wê dikirne berbad
Wê her digihande çerxê feryad.

Ewha ye di nêv Ereb de 'adet
Ger mîr bimire bimîne 'ewret

Yek sal û du sal dikine me`tem
Feryad û fixan dikan deimadem.

Xwes hatî bi Leylê 'adetê wan
Peyda kirî çare boyî efxan!

Me`tem wê dikir di nîvê e'wam
Der şîn buhurandî subh û hem şam

Çend rojê giriya li wê derê zar
Heta ku çû malê babî naçar

Feryad dikirin di gah û bîgah
Der qelbê xwe de digotî ew mah:

*Ser Ibnu Selam be rehmetê Heq
Wî daye ji işqê min re rewneq*

*Wî rakirî perdeê medara
Punhan xemê min kir aşikara!*

Gava bû bi qisetê xeberdar
Wî girt rehî deşte Zeydê xemxwar

*Wî dî ku şikiste halê Mecnûn
Rûniştî di nêv xeman de mehzûn*

Çû daye selam û kirye îlam:
Ba Ibnu Selma ci kirye eyam!

*Dehrê Ibnu Selam kirye pamal
Leylê çûye malê babî fil hal.*

Mecnûn kire ahî, kişandî efxan
Hêstir kişiyan ji herdu çeşman

Pur maye heyirî wî Zeydê xafil
Ev halî ji wî re hatî müşkil

Tehqîqî ji wî beyanê hal kir
Ev behs-i ji Qeysî wî sual kir

Go: *Ger bimire reqîbê aşiq
Ken lazim e, ev girî ci lahiq?*

Mecnûnî digo: *Ey wefadar
Qet nabe cîhan ji bo kesek yar*

*Neku hû bi yarê min re duşmen
Hem ew bûbû aşiqê wî, hem mem*

*Wî canê xwe daye, bûye wasil
Ew bû di meratiban de kamil*

*Ez hê negihiştîme kemalê
Tu qet meke eyb li min vî halî.*

Weqtê ku çû malê babî Leylê
Wê kir li fîxan û nale meyîlê

Wê girte terîqê ehlê me`tem
Tecdîdî xeba dikir demadem

Wê zanibû yek li kê derê zar
Bûye bi mûsîbetê giriftar

Dianîn û dibûne encumensaz
Cumle dikirin bi newhe axaz

Ger Ibnu Selamî bû behane
Mecnûn dibû ba`isê fîxan e

Ger çendî hebû di dev de yek zikr
Ema wê di dil de başqe bî fîkr

Daîm bi vê fîkrê ew perîzad
Her dem dikişandî ah û feryad

Naniye bi sûzî dil ewê tab
Yek şev ku belavî bûne ehbab

Ew mabû digel çirayê hemdem
Ew jî vemirand bi ahê purxem

Tenha dikişandî naleê zar
Derdê xwe kirin ji `icza îzhar:

*Ey derd û xemê zemane bîllah
Nabe tu bibî bi min re hemrah*

*Tenhayî ji bo xwe min kirî xwû
Te dayiye hindekî dinê rû.*

*Wê dî tu nebû ji xem nîhayet
Wê kir ji şebî siyeh şikayet:*

*Ey subhetê bextê min siyehpûş
Aşufte bike vî eqlê medhûş*

*Ewel tu nebû te qet qerarek
Her dem te li cîkî rûzîgarek*

*Hala ku ci re qerar dikî tu
Terkî rewşî ixtiyar dikî tu?*

*Te menzilekî dî kirye peyda
Ya d'zulmetê re te kirye wunda*

*Bo tîrî felek dibûm nîşan e
Ttahûneyê çerx re bûme dane*

*Me temkede ye ku işev alem
Mema ez û bextê reş di me tem*

*Nemayıye sebrê min ne aram
Çi d'ke bi min ez nizam serencam*

*İşev ku temam bûn kewakib
Seyrê dikin ew di nêv meratib*

*Ayîneê subhî girtiye reng
Nayê ji seher seda û hem deng*

*Ey subhê çewa bûye te ehwal?
Lê nadî tu dem, te nîne macal?*

*Ger dil te xweş bike tebesum
Wer mihrî heye bike terehum*

*Hemdem tu bike bi min xurûsî
Tev dengî meke sedayê kûsî.*

Bêhed giriya û kirye wê zar
Derdê dile xwe dikirne tekrar

Ne subhê, ne şeb nedane feyde
Derd nabine kêm, muqîmî zêde

Ber daye ewê ku feyzê wî 'am e
Wî kirye idare subh û şam e

Razê dilê zarî kirye axaz:
Key waqifê hal û hemdemê raz

*Nîne ji xemê me re nîhayet
Ez xem ji kî ez bikim şikayet?*

*Xem bê hed û ez gelek zeîf im
Ne taqetê min heye ne cîfîm*

*Ya tu bide qasî mihnet taqet
Yaxud bi qiyasê taqe mihnet*

*Ger cameî sebrê ez bikim çak
Der hukmê te de dibim xeternak*

*Ger ez bidime dil îstîmalet
Zêde ne ji min xem û melaleet*

*Namûsî ku jê bikim cudayî
Gel Qeysi bikim ez aşunayî*

*Tirsim bibe 'ismetê me pamal
Ez bo wî bikem muwafiqê hal*

*Ger ku wehe bike hifzê namûs
Me 'mûreê weslê min be mehrûs*

*Tirsim bike dûdê ahê Mecnûn
Halê minê zar bike dîgergûn*

*Ya Reb muteheyir im eza zar
Ez bûme bi mîhnetan giriftar*

*Sermenzilê emnê rah nizanim
Ez xeyrî te qet penah nizanim*

*Min her wehbihîstiye ku Mecnûn
Bûnefîrê nefîrê meftûn **

*Lakin eza bêmecal ci laiq
Bo husnî me kes bibîte aşıq*

*Yek dez-e (xakê) xakîsar im
Girdê rehê xakê rehguzar im*

*Gencîneê husnê re emîn im
Tu bûyî sebeb ku nazenîn im*

*Îmdadê bike ku ev emanet
Mehfûzî bibe heta qiyamet*

*Heta ku biçime meqberê tar
Rûyê me sipî, nebim fedîkar.*

* Bêjeyek ji nîvmalikê di fotokopî de nehat xwendin.

Ba 'iczê du 'a dikirye ew mah
Îzharê niyaz dikir ku nagah

Kêşaye ceres rehîlê awaz
Resmê huday kirye sarîbansaz

Bo ku çû kirin tedareka kar
Leyl rabûye pê xumar û bîmar

Efxanî dikir, ceres dibû pest
Camê meyî işqê naqe kir mest

Wê dî bi cemel re neşeyê hal
Bo naqe kîrî beyanê ehwal:

*Kay xaliye mûyê 'enberîn bû
Gulçehreê xwûyê hûrî xweşxwû*

*Sewdazede teşne der dîmaxê
Pêxwas û feqîrî dilbidaxê*

*Ez kî te diye vê zulmî bîdad
Her lehze dikî fîxan û feryad?*

*Mînî tu di 'ışq xwedanterîq î
Ger aşiqê min bûyî refîq î*

*Axir bi te re bû itifaqim
Rehmê ke bibîne iştayaqim*

*Lutfê ke bînayê kar ê xeyrê
Der meskenê Qeysî ke tu seyrê.*

Wê her weh digotî, bûye medhûş
Qet fikir nema, xwe kir feramûş

Bê hiş bû kete li erdê ew nûr
Maye ji heval û hemrahan dûr

Wer bûbû siyahiyê şebî tar
Yekcar nebû sarîban xeberdar

Hiş hate serî û ew perîweş
Maye di vê êşê de müşeweş

Çeşmê xwe vekir nedî ewê kes
Qet naête guh seda û ne hes

Bê hed kire cehd ewê nig û pû *
Wê rahî nedî, gerrî li her sû

Ne rahî ne rahîber ewê dî
Ne j`qafilê xwe eser ewê dî

Tenha gerriyaye ew sîmenber
Der tarî, mîsalê mahî enwer

Heta weku roj-i derketî ferd
Wek Leylê dikir cîhanê ruxzerd

Leylê digerre bi cergê pirxwûn
(Wê rahî kete) diyarê Mecnûn

Her weh li terîqê gerriye ew mah
Yek merdê hezînî dîtî efagah

Bo pirsê 'elametê menazil
Bûye li wî merdî gelkî mail.

* PÛ: pî, nig. Nivîskar ji bû lihevanîna qafiyê wisa
nivîsiye.

Ba lutfê kirî tekellum axaz:
Kitî tu gihande goşî awaz?

Çeşmê xwe vekir esîrê Mecnûn
Wî daye cewab feqîrê mehzûn.

Leylê weh ji wî re gotî me'zûr:
Haşa bike behsê ejdihamûr

Haşa bibî zaxî, bulbul im ez
Ba lafî bibêje, xargul im ez.

Mecnûn weh go: *Ey durrî yekane*
Mecnûn re tu zanî qet nîşan e?

Leylê weh go: *Ew perî lîqa ye*
Ruxsar û qedî wê dîlruba ye

Tu şîfîteê esîrî me`tem
Ruxsarî şikiste qametet xem

Tu xwarî û ew `ezîzê alem
Tu bê ser û pa yî, ew mu'ezzem.

Mecnûn weh go: *Ehlê işq dibe xuwar*
Bo ehlê husnê sefa sezawar.

Leylê weh go: *Ey behane perdaz*
Qeydî dilê zarî re fusûnkar *

Mecnûn dibêjin ehlê îdrak
Eş'arî letîf û lehce wî pak

* *Di malikê de newekhevîtiya qafiyê heye, diyar e ku şas e. Diviya ku "fusûnkar" fusûnsaz" bûya.*

*Kanê bi te re sedayê dilsûz
Eş'ar û hîkayetê dilefrûz?*

*Mecnûn weh go: Ehlê hal dibe lal
Bo min bese, eşkî şahidê hal*

*Tertîb û 'ibaret û fesahet
Uşşaqt re dibe delîlê rahet*

*Ey subhetê min ji rahetê dûr
Samit bibe ew dibîte me'zûr.*

*Leylê weh go: Ey ze 'îfê naçar
Mecnûnî bike tu halî îzhar*

*Leylê dihebîn bike tu bunyad
Yek şî'rê mazî tu bike yad.*

*Mecnûnê hezînbihîstî sewgend
Zanî ku li şî'r e arezûmend*

*Tefsîlê xemê xwe kirne îcمال
Bo wê kire 'erzî sîret î hal:*

*Ey sebzî derdî re didî ab
Serrişteî raz re fatihê bab*

*Ez bo te xemê hebîbî bibêm ah
Yan bidme xeber ji te'nê bedxwah*

*Kêşame çiqas cefayê mekteb
Her roj di meşegetê heta şeb*

*Axir ku bû zehfî te'nê exyar
Ez dûrî kirim ji yar û dildar*

*Faş bûye di alemê de ev behs
Babê me bêçare kirye hawes*

*Geh dexdexê tebîbî min dî
Geh daye me zû li beytê cindî*

*Geh Newfelî re me kir tederru'
EZ feyzê wî min nedî teweqqu'*

*Geh ji Ibnu Selam re yarî bû yar
Pur daye minê feqîr î azar*

*Geh min bi peyamê Zeyd ìnan kir
Her we 'de ku da min rasti fehm kir*

*Ba hêvî me 'umrî bûye zayı'
Heta me li ten bû zi 'fi tali'*

*Hasil me wucûdî bûye herbad
Yek lehze nebûm ji dest felek şad.*

*Mecnûn ku qenc dizanî Leylê
Hêstir rijyan bi şubhê seylê*

*Bê hed giriyanbû, bûye nalan *
Go: Ey ji mi re çirayê çeşman*

*Ê ku me digo, tu ew hebîb î
EZ derdê dilê me re tebîb î*

*Tu yî me muqîm di dil de zikrim
Der qelbê mi de xiyal û fikrim*

* Leylê hêj nû dinase ku ewê li erdê dirêjkirî Mecnûn e.

*Çendan me tu nas nekir rewa ye
Mest im, heçî mestê êşê xeta ye*

*Her ci kesê ku ji xwe be xafil
Xelqê bike nas, ê nabe qabil.*

Weqtê ku gihişte dîmaxê bûyet
Çeşman dî şu'a ê mahê rûyet

Can bê xeber û bû eqlî şeyda
Ten kirye sed îzddîrabê peyda

*Der behrî teheyyur dibûme xerq
Min tu nekirî ji xeyrê te ferq*

*Me'zûr bigire, ey senem vî halim
Te'nan meke û mede înfî'alim*

*Bê te bîwîbûm şikiste xatir
Sed şukir gihîştîme te axir*

*Gulzarê umûdî bûye têrab
Ya Reb, eceb, ev xiyal e, yan xwab?*

*Der iş tterebe çira xuya bû
Bextê me meger ji xew şiyar bû*

*Ey dil tu muqîm bi ah û nal bû
Her dem te temennî wîsal bû*

*Ey dîde birrêj siriskê gulgûn
Her weqt te digo ku kanê? Mecnûn*

*Menzûrê te bûye ew sîmenber
Meqdemreh bike nîsarê gewher*

*Ey can ku mudam te ûntîzar bû
Daîm te rica wîsalê yar bû*

*Axir te dî derkeve tu ez ten
War yar e kes îxtîlatê benden.*

*Mecnûn go: Wuha dibêjî tu raz
Ba lutfê bike tu min serefraz*

*Kê yî tu bike vî resmî zahir
Te çi ye murad li çolê sair?*

*Can taze dibe ji fesahetê te
Ev lehceê pur melahetê te*

*Te xulqxweş û lutfi canfiza î
Awha dixuyê ku aşuna î*

*Bîllahî tu tê ji çi diyar î?
Tu tê ji çi rah û rehguzar î?*

*Ger lale î, tu ji kîje bax î?
Wer sosin î tu, ji kîje rax î?*

*Bê hed te heye şêrîn tekelum
Bo halê dilim dikî terehum*

*Aqil bibûna bi min re hemrah
Elbette dibûm bi halî agah*

*Ger xem nekira dilê me bîtab
Perde nebûna ji çesm re xwûnab*

*Ez derdiketim ji navî xeflet
Kî bûyî tu min dizanî elbet.*

*Leylê weh go: Ey qerîneê rûh
Kamê dilî mubtelayê mecrûh*

*Mujde ji te re zemanî da kam
Bo te meyê işret kete cam*

*Mujde, te muradî bûye hasil
Tu bûyî bi meqeda xwe wasil*

*Leylê ez im, arezuwê canet
Kamê dilê zar ï natuwanet*

*Muştaqê cemalê bûy hemîşe
Muhtacê wisalê bûy hemîşe*

*Dîdar bûye boyî te muyeser
Teqsîr û te ellulê mede ber*

*Ez dewletê weslê bîn xenîmet
Wer ba min û fewt meke tu furset*

*Dil nezrî wîsal ê qametê te
Min can jî heye emanetê te*

*Çûn bûye mecal, medê tu qet bîn
Wer nezr û emanetê xwe bisiûn*

*Ger naxwoş ï tu, ez im tebîbet
Wer aşiq ï tu, ez im hebîbet*

*Bo bezmê wîsal bibe tu mehrem
Yek lehze bibe bi min re hemdem*

*Bo nerkis û lale re tu rewneq
Zîbê tu bide rihan û zenbeq*

*Feyrûzî bike qerînê yaqût
Bo tûtî bike ji qendê nab qût*

*Peywende ke bo gul erxewanî
Bîghîn Xîzrî abî zendeganî*

*Wer aşiqê mubtelane î tu
Mecrûhê xem û belane î tu*

*Tu eqlî bike ji bo xwe peyda
Tu min bike der cîhan de riswa*

*Ey gul nehin ev ji bo mi re teng
Ba halê mi re nebî tu hemreng*

*Min erzî kir afitabê ruxsar
(Tu çê kî) heraretê xwe îzhar*

*Îzharê cemalê xwe bike gul
Bulbul bibîne bike texaful.*

*Mecnûn weh gotî: Ey perîwes
Tu bermede vî dilê min î ates*

*Zînhar tu meyîne, ey sîmenber
Ayîneê 'arizî beraber*

*Ewel ku hebû di çesmî de nûr
Daîm tu hebû li qarşî, ey hûr*

*Hala ku nezare bûne müşkil
Bo çi tu dibî bi min muqabil?*

*Isq kirye bînaê weslê mehkem
Me'nîde kirim ji bo te hemdem*

*Lezet ji ruxê hebîbî dildar
Can e ku ji can dibîne, ey yar*

*Min can ku çûye gelek zeman e
Ev can ku di cism e, başqe can e*

*Hala tu yî can di cismê Mecnûn
Der çeşmî de nûr û der cîger xwûn*

*Herçî ku hebe bi min re, tu yî
Ez qet tune me, muqîmî tu yî*

*Ger ez ez im û tu tu yî, ey yar
Wer ku tu tu yî, ez im ezê zar*

*Ewel ku ev iş bûye bunyad
Yek tuflî bûm ez zemanê ustad*

*Ger bû dilê min bi te meqeyed
Goya ku dida me dersê "Ebced"*

*Hala ku me kir kemalê hasil
"Ebced" qe dixwûne merdê kamil?*

*Çun ketye kemalê serxetê eşq
Serxet bibînim li ber bikim meşq*

*Ez bûme wuha cunûn û berbad
Tu hem meke vê sulûkê bunyad*

*Tu bigre di 'issmetê de aram
Riswa ez û tu bibe nîkunam*

*"Mecnûn" ji min re dibêjin alem
Îlla ji me re cunûn musellem*

*Tu mebye fisaneê xelaiq
Îşê me ji bo te re çi laiq?*

*Tu qet meke haiê xwe dîgergûn
Leylê çi rewa bibûte Mecnûn?*

*Tu pernişîn î be hemîse
Daîm tu bike hîcabê pîşe*

*Rehmê bike ey butê wefadar
Da kes neke ser me te' nê, zînhar!*

*Weqtê weku işqê eqlê min bir
Namûsê ji bin emin jîhîr kir*

*Tu eqlî bike ji bo xwe bunyad
Namûsê meke wekî eme berbad.*

*Leylê weh go: Ey wucûdê kamil
Bo qurbê Xuda bi 'issme mail*

*"Ehsente" ku zatê pakî tu yî
(Panîr e) wucûdê xakî tu yî*

*Işqî te em in, riya guman kir
Ettwarê te min me îmtîhan kir*

*"El minetu lîllah" bûye me 'lûm
Weslet bû di mezhebê te mezmûm*

*Xemnakî bûm ez te kirme purşad
Ez qeydê te 'eluq bûme azad*

*Yek xafil xudperestî bûm ez
Ba cehlê mudamî mestî bûm ez*

*Arayışê zulf û xal dikir min
Peyweste wuha xiyal dikir min*

*Me d`go, telebê wussal dikî tu
Nezzareê zulf û xal dikî tu.*

*Rewşen bû ji bo me hala halet
Mîracê heqîqet ê kemalet*

*Ev xalê siyah û zulf û kîsû
Ev çesmê di reş kemanê ebrû*

*Bo min nehin ev hemî şeb û rûz
Nezra nezzera te dilefrûz*

*Me go, tu li van bikî nezar
Teskîn tu bidî dilê neçar*

*Hem tu bibî ba muradê wasil
Hem bo me bibe sewabî hasil*

*Nîne te li wan qe meylî carek
Çi b`kim bi vê xwûbiyî mûbarek?*

Der durcê ten im, durrê rewan im

..... *

*(Me d`go, bibne serf rehguzaret)
Bo meqdemî ez bikim nisaret*

*Min bo xwe wuha dikiryê idrak
J`endîşêê hîcrê ez bibim pak*

* Ev nîmalik di nivisa bi tîpêñ erebî de nehatibû nivîsandin.

*Hal ku nebû muyesser ew kam
Bo çi xwe bikim melûl û bednam?*

*Nesxê xettê î tîbarê kir min
Rahê 'edem î tîbarê kir min*

*Heta ku bide xubarê sûret
J'ayîneê zaî re kedûret*

*Weqt bûye bibe me ruhnî mi`rat
Mustexnî bibe sîfatê ez zat*

*Ba xwûnê xeman tijî bû min dil
Teshîhê bi xunçeê gul û mil*

*Ferz bûye ku ttey bikim bîsattê
Êdî bikim qett'ê îxtîlattê*

*Mestûr bibim nêv feta hîcabê
Bigrim ruxê xwe 'edem nîqabê*

*Ta husnê ruxem nexwaz dikir yar
Da nebye nessîbê çeşmê exyar*

*Zîra ku nişatê husnê qabil
Aşıq bibitin ji bo wî kamil*

*Hîna ku nebû qebûlê aşıq
Hinde xwe feqîr bikim çi laiq?*

*Hê xetim nekir kelamê ew mah
Yek naqe nişinî dî ji nagah*

*Der rahê weh têtin ew subukxîz
Leylê dî ku tê wekî nesîmê tîz*

Zanî bit gulruxê sîmenbûy
Bo wê ewê tê qenc-i xweşxwûy

Teşbîhê bi hîvê bûye xaib
Rabû meşîya çû pêşî talib

Hêja ku ji bax xelas nebû xar
Gul kirye wîda'ê sehnê gulzar

Waqif qe nebû ji halê wan xeyr
Ajoťi cemazeê subuk seyr

Tewfîqê muradê bûye hasil
Rabû meşî kirye 'ezmê muqbil

Mecnûn dîse maye zar û mehcûr
Hem suhbetê mar û hemdemeş mûr

Bo sekin nebû wî qet qerarek
Nejgerreh di dest de ixtiyarek.

BENDA ÇARADA
DI BEYANA EHWALE KEMALA
MECNUN DE

Şahînşehê mulk ê mihnet û derd
Yanî weku Qeysê derdîperwerd

Yek pakî bû der vê 'irseê xak
Teşbîhê bi wî nedîbû eflak

Çûn nefretê şerr ê îbnîadem
Wî kirye bi wehşiyân musellem

Zahir wî refiqê wuhûş û hem teyr
(Batin bû bi reh furuşte) hemseyr

Nekeşand wî di cîhaned wî durê ferd
Endîşeê germ û xusseê serd

Wî girtibû rahê ehlê tewhîd
Ket rahê kemalê bi terkê tecrîd

Wî bûbû wucûdî pak î purnûr
Ji aysiê ekl û şurbê bû dûr

Tehsîlê dikir sefayê sîret
Dîbû ji mecaziyê heqîqet

Mewzûn bû wî tteb' û nukte danî
Her nukte re waqifê me'anî

Esrarê dilî bi şubhê emwac
Bîtin bi telattim û bi efwac

Dil bû wekî behrê Hind û 'Umman
Enwarî dicûn heta bi esman

Ew qabil û cism û şikl û sûret
Yekser bûye ruh û ketye heyet

Dikşandî ji ateşê dil awaz
Ji teyran wî digirtî rah perwaz

Geh, geh xezel û gehî qesîde
Înşa dikirî sitim resîde

Ba sûzî dixwendî gah û bîgah
Çend heb ji heval bi wî re hemrah

Dinvisîn wan ji şî'rê nadir
Her dem dibirin li nav 'eşair

Der alemê ev xerîbê mehcûr
(Bîllahî ... ev wa) bûye meşhûr

Wî dengû û zihn û hem cemal bû
Lewra ku gelek xwedankemal bû

Herçî ku bibe ji van re qabil
İlla ku dibe wî zatê kamil

Her dem wî dikir kemalê îzhar
Ebyat û şî'ir dikirne tekrar.

BENDA PAZDA DI MIRINA LEYLÊ DE

Tarîx niwîsî halê eyyam
Ev qeddeye wuha wî daye îtmam

Weqtê ku nebû ji wessl û tesellî
Mecnûn qe nedî wîsalê Leylê

Leylê dibirri te 'elluq ez can
Qett'a nezerê dikir ji canan

Me` temkede bû bo 'irsseê bax
Me` temde surûdê nale ê zax

Teşbîhê bi Leylê lale mestûr
Wek Qeysî bû şaxê erxewan 'ûr

Rencê wereqan dikir be eşcar
Lerzan û zeîf û zerdî ruxsar

Bo gul vemirandî bayê Ssersser
Her laleçirax nemabû eser

Yek roj di vî weqtî Leylî zar
Bo def'ê xeman diçû ber gulzar

Wê dî di gulan tu nîne eser
Da new'ê şecer ne belg û ne ber

Der sehnê çîmen sefa nema ye
Nuqsanê sefa kemalê daye

Nemaye di sebzê ten de qet tab
Ne d'bergê ruxan de qitreyek ab

Me`temkede dî wê bûsitanî
Narê riqetê digirte canî

Ez sûzî cîger dibûye sûzan
Şerh kir xemê xwe ji bo gulistan;

*Ey baxî, gi ye vî ahê serdest?
Teşbihê bi min xuya be derdet*

*Ez jî bi şebîhê te nejar im
Ruxzerd û zeîf û purneçar im*

*Gerçî bi xezan tu bû giriftar
Hêvî te heye ji feslê buhar*

*Umîdî wîsalê bi min re nîne
Teqdîrî wusa ye, çare nîne*

*Xem bûne ziyade talî ez derd.
Ber da girî, da sema ruxê zerd*

*Me'bûdê xwe re 'urûzî kir raz
Ez xaliqî kir rica û niyaz;*

*Ey hakimê ûrseeê qiyamet
Sultanê serîr ê istidamet*

*Der atesê hêumîdî bûm nar
Bîllah ji wucûdê bûme bêzar*

*Çu j`canebê dostî naqebûl im
Ba melûl im*

*Ez şem î şehî fîraq î yar im
Sûza bû sîyahî rûzîgar im*

*Me d`go ku, bibe wucûdî baqî
Şayed bibe weslê ittîfaqî*

*Hîna ku nebû wîsalê yarim
Min zanî wucûdî bû sitarim*

*Ya Reb bi beqa bike me mulheq
Çun rahê beqa ye ev rehê heq.*

*Pak bû dil û kir du`ayê tesîr
Fîl halî mîzahê bûye texyîr*

*Tesîrê hewayî namunasib
Zu`bek li beden dibûye xalib*

*Hindî ku diçû ziyade bû derd
Te b`lezhe kîşandî naleê serd*

*Mehw bû ji xeman ew perîweş
Teşbîhê bi şem ê girtî ates*

*Zu`fa tenê wê ji ber birîna
Ket rutbeyekê nehate bîna*

Nav cîdehe teleb dikir nişaneş
Ne d`dît wucûdê natuwaneş

Rabûne nîşaneê selamet
Bo mergî xuya bû sed 'elamet

Niyet dikir ew bibe musafir
Rehlet esereş ku bûye zahir

Rabûye hîcabê ihtîrazeş
Faş kirye ji bo diya xwe razeş:

*Ey ummî ku bo dilem dewa î
Şem'a emelim re her ddiya î*

*Ba razî xeman da, canî da der
Ta mumkinî bû nedaye min der*

*Hala ku çûyîn bûye muqerrer
Ferz bûye ku vê sîrrê bidim der*

*Bo te bikim ez vê helîmişkil;
Ez derdê hewa hilakî bû dil*

*Der cismê me de nehin tu tabek
İlla xemê işqê îzddîrabek*

*Ez aşiqê zarî bê newa yim
Yek mahê lîqa re mubtela yim*

*Sewda ye, wuha ye, zeîf û zar im
Çûye bi hewayê rûzîgar im*

*Pir arezû kirye min cemales
Yek rojê nedî me qet wîsales*

*Hala derim, nar di dil de, Mader
Çi b'kim wuhe bû qeder, muqedder*

*İlla ne tenê ez im perîsan
Ez mîhnetî yarî zar û giryân*

*Ew hem bi me zarî mubtela ye
Sergeşteê wadiyê bela ye*

*Ez men bûye wî cunûnî efzûn
Qeys bû ewî, navî bûye "Mecnûn"*

*Daîm di xemim dibore (elsam)
(Hubî cîhan nebewe) wî hasil kam*

*Riswayê zemane bûye bo min
Afaq re nîşane bûye bo min*

*Axir derim ez cîhanê xeddar
Meqsed ew e jê nehim fedîkar.*

*Ey mûnisî rûzîgar i Mader
Xemxware û xemkusar i Mader*

*Bo rahê beqa ku 'ezim kir min
Dunyayê denî wîda 'ê kir min*

*Ew dê hikîşîne ah û efzan
Belkî demekê ji dewr û ezman*

*Te rah bikeve li wî diyarî
Erz ke xemê me wî dîlfikarî.*

*Zînhar! ku tu bû bi wî re wasil
Xwesmerd e ji wî nehî xafil*

*Pabûsî bibe, riza bixwaze
Bo min tu ji wî du 'a bixwaze*

*Erz ke, ji wî re bibêje: "Dildar
Can daye ji bo te Leylî naçar*

*Işqî te de çend didane lafek
De 'wa de ewê nebû xîlafek*

*Söyle, beni zari mubteladen
Kay işqi de lafiden wefaden **

*Xelwetgehê insî bo me mehrem
Azade û şadî bo me xurem*

*Hem tu jî were meke te 'elul
Ez muntezir im meke texaful*

*Ger sadiq î tu di işqê de hem
Sebrê meke bigre terkê alem*

*Tu wer bibin em bi kamê dil yar
Der cayekî qet tu nîne exyar*

*Daîm bibin em di cîkî hemraz
Dernakeve jê tu deng û awaz*

*Xweşmenzil e girtiye me ev rah
Bê te 'neê xelq û dost û nedxwah!*

*Min lazim e te bikim xeberdar
Bîsmîllah eger îradetin war."*

* Ev malika bi zimanê tirkî weha ye: *Bêje ji minê jar ê
bi bela re, çewa ji evînê wesfayek diaxive.*

Çun kirye wesiyyeta xwe axir
Ezimrehî kirye bo musafîr

Yad kirye wê yarî mihrîbaneş
Ba hêviyî weslî daye caneş.

Ki ye di cîhan de nabe fanî
Peyda bike 'umr û zendeganî?

Dunya çi ye, heftser ejdiha ye
Endîseê ulfeteş xeta ye

Ki ye ku girê de puşt bi dewran?
Her hatin û çûn karî ezman

Dunyayê meke ji bo xwe meqsûd
Peyda ke rizayê Heq ê me bûd

Qet nabe kesek ji bo kesek dost
Ha ku te dî maye hestî û post.

Ya Reb tu nekî vî Xakiyê jar
..... her giriftar. *

Leylê gulî gulşen î lettafet
Ez badî xezan ku dîtî afet

Pamalî xezan bû buhareş
B`axir ku resîdê rûzîgareş

Bêçare diya wê kirye zarî
Serqot û sîrişkê xwûn dibarî

* Nivê nîvmalik di fotokopî de nehate xwendin.

Hêstir rijiyan ji herdu çeşman
Ba sûzî dil ew dihate efxan

Hasil kete ew lîbasê me`tem
Bo waqi`e cem û bûne alem

Van cumle dikirne ah û efxan
Dunya dibûye şebîhê tofan

Efxan digihane çerxê ettles
Dar û ber û teyrî sîne bûn çak *

Hasil vekirin ji wê re meqber
Teşbîhê bi rewdeyek munewwer

Teşbîhê bi gencekî tijî durr
Ez nûr û ddiyawê işqê bû purr

Ten bûye muqîmî ırsseê xak
Ruhê wê gihişte ewcê eflak

Qurbiyetî Heq dikirye hasil
Hêj ew bû bi meqseda xwe wasil.

* Di malikê de newekhevîtiya qafiyeyan heye, diyar e ku
şasıyek ketiye nivîsa bi tîpêñ erebî.

**BENDA ŞAZDA
BIHİSTINA MECNÛN MIRINA
LEYLÊ Û MIRINA WÎ LI SER QEBRA
LEYLÊ**

Sarrafê nuqûdî nukte danî
Hedadê selasil me'anî (anî)

Zencîrê wuha kirî muselsel
Qisse bi vê terzê kir mufessel

Go: Leylê ku bû fena ji fanî
Ruh çûye serayê asîmanî

Bû xerqî di ni'meta mudamî
Bo wê hezinîn xewas û 'amî

Heta weku Zeyd ê dilkul û zar
Ew bûye bi waqi 'ê xeberdar

Fîl halî wî kir 'ezîmetê rah
Mecnûnê hezinî kirye agah:

Kay şîfîteê şikiste tali'
Heyfa ku te se'yî bûye ddayî'

Tesîrê tilismê bûye battil
Êdî ji vê meşxelê çi hasil?

Leylê çû û da te zendeganî
Tu sax bî ku Leylê bûye fanî

Bû sedqe ji bo te ew perîwes
Wê 'umrê xwe da te, ey belakes

'Ezmê rehê cennetê kir ew hûr
Fîrdews de meqamî kirye me'mûr.

Mecnûn ku bi qissetê bû agah
EZ sûzî cîger kişandî yek ah

Ez naleê wî di wê zemanê
Leylê dibihîst di wê cîhanê

Lê zehfî nema ji nale û zar
Leylê ji xewa ecel be bîdar

Her lehze dihate nale û koş
Ket erd û nemane eql û hoş

Hîna bi xwe hat, dikirye efxan
Cûbarê di xwûn kişîn ji çeşman

Ev sozî kirin ji Zeyd re bunyad:
Kay saqiyê bezmî bîdad?

Îro çi re quesdi canê min kir?
Qesda dilê natuwanê min kir?

*Ev camî te da me, zehr bû ew cam
Mizgînî mirin te kirye î'lam*

*Tesîrê sitem tu îctînab ke
Ber vî gunehî ve tu sewab ke*

*Tu min bîghîne wî diyarî
Tu min bike şem' li ser mezarê.*

Ket rah û meşî bi Zeyd re hemrah
Ba halekî wer, ne'ûzu bîllah!

Çeşmê wî ku ket bi meqberî yar
Ket, kirye hemêz mezârî dildar

Sîne wî bi şubhê lehdê kir çak
Wek qebrê li ser serê xwe kir xak

Ser qebrê rijand sîrişkê purxwûn
Çol bûye herî ji eşkê Mecnûn

Bûn eşkê di xwûn digel hewarê
Der qebrê nîsar ji boyî yarê

Ew bûye bi eşkî re muxateb:
Key tîz e şevê fîzaqê kewkeb

*Derkeftin bo te bûye wacib
Çun bûye ew aftabî xaib*

*Yek burcê meqamî kirne ew mah
Reh nîne, neşim bibîte hemrah*

*Derkev ku heye eger te murwet
Her qebrê bike ji wî re xizmet.*

*Kanê li kû ye durrê yekane?
Ba wê çi kir afetê zemane?*

*Pabûsî bike, bike niyazim
Tu erzî bike ji bo wê raz im*

*Kay şem î çi ye ev îctinabet?
J'ev bextê reşî çi ye hîcabet?*

*Camî mey xemgerrê di 'alem
Ew camî te xwar û min jî xwar hem*

*Tu mestigîr î meger ku bade
Bezmî de meger nema ziyade*

*Bo min tu bû şem'ekî sebefrûz
Peyda bû jî te vê işqê dilsûz*

*Nanî te bi aşiqê xwe qet tab
Çesmê te yî reş bû mailê xwab*

*Hemrahî me bûy di reh de, ey mah
Hemreh dihêle diçîte hemrah*

*Li eflakê bike tefaxur, ey xak
Bo te bû refîqê dirrekî pak*

*Ba zulfî mebe mufaridd ey mar
Çun tê de muqîm e her dilê jar*

*Ba xalî mebe mu'aridd ey mûr
Her dem ku li wê be canê mehcûr*

*Ey 'umrî were xelas be tu hem
Reş bûye li ber çesmî alem*

*Alem ci bû xweş ku tê de dildar
Dîlber ku tune, zelîl im û zar*

*Ey can tu were ji min wîda' ke
Ba min nexweşî tu bes nîza' ke*

*Muştaq im û ey ecel kerem ke
Def'ê elem û tu def'ê xem ke*

*Texlîsî me jîiddîrabê xem ke
Ba mujde wucûdê min 'edem ke*

*Ayîneê min ji zengê ke pak
Min perde bike bi perdeê xak*

*Rake ji me vê hîcabê hail
Tu min bike ba nîgarê wasil*

*Teklîf dike weslê bo me re yar
Der xelwetekê ku nîne exyar*

*Çûyîn ji me ere qewî xeta ye
Bo min ji te yek meded rewya ye*

*Bîllah di meded meke tu îhmal
Rû daye ji bextê min re îqbal*

*Bo min dehî cism û can-i nabe
Bê yar ji me re cîhan-i bane*

*Mîn be'dî, zelîl û xwar meke min
Sergesteê rûzîgar meke min.*

*Çun razê dilê xwe kirye tefrîr
Waqif bû bi rayê wî re teqdîr*

Îmdadî dikir Înayetê Heq
Ew kirye bi meqeda wî mulheq

Gul ma di hedîqê emel da
Mey xwar di kaseê ecel da

Wî kirye hemêz mezarê yarê
Can kir sedeqe ji bo mezarê

"Leylê" go û daye canê şirîn
Wî aşiqê bêqerar ê miskîn.

Înaf e? wuha dibe mehebbet?
Ev daîre ye meqamê heyret

Goya ku di destê wî de bû can
Canê xwe kire nisarê canan

Hindî ku hebû ewî nîgarek
Alem de dikir ewî qerarek

Çun kirye nîgarê terkî alem
Wî jî kire terkê alemê hem.

Weqtê ku dî halî Zeydê xemnak
Sîne bi şebîhê gul kire çak

Ba ahê wî newhe kirye bunyad
Kêşaye felek wî dengê feryad

Kir ah, û fîxa kirî di ew dem
Ez dad û hewar civîne alem

Alem civiyan kirin nezare
Mecnûnê esîr xwe da mezar e

Mecmû' civiyan nerîne xeylê
Can kirye nisarê payê Leylê

Wan dil şewitîn û kirne zarî
Hêstir ku ji çesmê wan dibařî

Teşbîhê meter ji ewrê quđret
Rabû li ewan qiyamê sa'et

Bo wî girîyan hemî seraser
Axir bi defin kîrin muqerer

Ew xeslî kîrin şehîdê bîmar
Ew qebrî vekirne tê de dildar

Ew jî kirne di wê mezarê
Xemnakî gîhişte xemgusarê

Ruh bûne di cennetê de hemraz
Ten bûye bi ten di erdê demsaz

Rabûne ji wan hîcab û hail
Qasid bû bi meqseda xwe wassil

Yek bezmî du şehre bûye mehfil
Yek burcî du mîhre bûye menzil

Danîne li ser mezarê nîşan
Yanî ku "Ev şehîdê hîcran."

Zâîrî dibin muradê hasil
Mexlûq li ziyareta wî mail

Hindî ku diçû dibûn mukerrem
Hacetgehî bûn ji boyî alem

Hem bo esera muhebbeta pak
Xweş mertebe ne bikî tu îdrak.

*

Ya Rebî bi heqê Leyl û Mecnûn
Ya Reb bi sirişkê wan ê purxwûn

Ya Rebî bi Leyl û vê cemalê
Ya Rebî bi Qeys û vê kemalê

Ya Rebî bi abî çeşmê Leylê
Ya Reb bi sirişkê şubhê seylê

Ya Rebî bi eşkê Leylê purxwûn
Ya Rebî bi naleê di Mecnûn

Ya Rebî bi Leyl û çeşmê şehla
Ya Rebî bi Qeys û wayêweyla!

Ya Rebî bi Leyl û eqlê mestî
Ya Rebî bi Qeysê serguzeştî

Ya Rebî bi Leylî pur tehemmul
Ya Rebî bi Qeys û wî dilê kul

Ya Rebî bi Leylî şubhê horî
Ya Rebî bi Qeysê narê dûrî

Ra Rebî bi Leyl û iştıyaqê
Ya Rebî bi Qeys û iftîraqê

Ya Rebî bi Leyl û 'ismeta pak
Ya Rebî bi qelbê Qeysê xemnak

Ya Rebî bi Leyl û zulf û xalan
Ya Rebî bi Qeys û ah û nalan

Ya Rebî bi Leyl û dêmê xerra
Ya Rebî bi Qeys û geştê ssehra

Ya Rebî bi Leyl û qelbê purxem
Ya Rebî bi Qeysê derdîhemdem

Ya Rebî bi Leyl û dîlfîkarî
Ya Rebî bi Qeys û derdidarî

Ya Rebî bi Leyl û ah û hesret
Ya Rebî bi Qeys û narê firqet

Ya Rebî bi Leyl û çeşmê bîmar
Ya Rebî bi Qeys û wî dilê zar

Ya Rebî bi Leyl û dilê biderdî
Ya Rebî bi Qeys û dilnuwerdî

Ya Rebî bi Leyl û cismê naxwêş
Ya Rebî bi Qeysê dilmuşewêş

Ya Rebî bi Leyl û derdê hîcran
Ya Rebî bi Qeys û dad û efxan

Ya Rebî bi işqê herdu şahan
Ya Rebî bi ddiyayê herdu mahan

Ya Rebî bi heqê navê Ehmed
Rehma xwe bikî li Can Muhemed

Vî rûreşê nakes û gunehkar
Daxil nekî wî di ateş û naş

Defter tijî kir ji zenb û issyan
Reş kiryе bi şubhê qîr û qitran

Ger efû nekî vî muznibê pîs
Tehqîqî dibe hevalê Iblîs

Min hêvî ye ey xwedanê îhsan
Xakî nekî daxilê di nîran

Ey padîşehê li kursî yê heq
(Der karê kerem nekî tu muxleq) *

Min zenbî pir in wekî çiya ne
Barê gunehan li min giran e

Ez xeyrê guneh, emel me nîne
Ez heybetê te dilem birîn e

Ez barê guneh biwim xwedanxem
Bo min kî şeffî Resûlê ekrem

Karê me li ser guneh dewam e
Ey xaliqê heq te rehmî 'am e

Ya Reb tu bi heqê Ehlê Beytê
Min mucrimî dûr bikî ji pêtê

Hassil tu miñ û cemî'ê îslam
Mehrûm me nekî ji Fexrê Enam.

* Ev nîvmalik di fotokopiya erebî de geleki reş derketibû. Bi gumana çewa ku me di nav kevanekan de nivisiye dihate xwendin.

BENDA HIVDA
DÎNA ZEYD LEYL Û MECNÛN DI
XEW DA

Ey xame were bike terennum
Hem qissetê xwe bike tekellum

Rawî wuhe gote min bi ixbar
Ew neqlî ssehîhî bû bi asar:

Ew herdu ku bûn xerîqê rehmet
Ma Zeydê feqîr di narê hirqet

Ew bûye li meqberî mucawur
Wî kirye ssedaqeta xwe zahir

Wî
..... *

* Ev malik di teksta erebî de nehâje xwendin.

Her dem ji heraretê dil û ten
Qendilê mezarê kirye rewşen

Her lehze dikir wî taze me`temn
Nedkir wî fixan û nale qet kem

Wî munîsê müşfiq û muwafiq
Yek şevê di qerîbê fecrî ssadiq

Êdî wî nema ye taqet û tab
Pal daye mezarê, çûye der xwab

Der xwabî de dîtî wî neçare;
Der gulşenekî du mahî pare

Ruxsarî ewan ji zewqê purnûr
Ew bûne ji xem û xusseyan dûr

Xweş herdu nişadimend û dilşad
Ez te'neê xeyrî bûne azad

Ba her yekî sed furuştasûret
B`ixlasî dikan ji wan re xizmet

Wî pursî ku: *Herdu ev ci mah in?*
Kîjan rutbê de padîşah in?

Ev rewde ci rewdeê berîn e?
Ev qewm ci qewmê nazenîn e?

Bo wî wehe da cewabê Ridwan:
Ev qewmî xeciste hûr û xilman

Ev herdu mehê xicisteruxsar
Mecnûn e û Leylêyî wefadâr

*Çun ketne newalî işqê ew pak
..... ew cak **

*Menzil bûye wan di baxê ridwan
Xuddamê ewa ne hûr û xilman.*

*Çun bende riza bidin qeddayê
Ssebir bikin ew li ber belayê*

*Hîna ku çûn ez cîhanê fanî
Texlîssî bûn ez xemê cîhanî.*

*Zeyd weqtê ku bû ji xwabê bîdar
Ev nukte kirî ji xelq re îzzhar*

*Bo xelqê bû i'tîqadê efzûn
Bo qebrê ziyade bûye qanûn.*

*Herçî ku vê qisetê bibînin
Nazîm bi du'a di bîr xwe bînin.*

* Ev nîvmalik di fotokopî de nehate xwendin.

SAQÎ, NAME Û XETMÊ KÎTAB*

Saqî bide min şerab û bade
Da pê bikim ez ddemîrî sade

Îhsan ke, bide me çendî saxer
Bûye ji xeman me dil mukeder

Saqî bide min bi reqs û govend
Da bêne xiyalê min şekerxend

Saqî bide min ji abî engûr
Îmdad ke, bike bi şurbê mexmûr

Bint-ul 'inebî di camê zerîn **
Bo min bide, şâ ke qelbê xemgîn

* *Saqî*: Meygêrr. *Xetmê Kitab*: Kutakirina Pirtûkê.

** *Bint-ul 'ineb*: Keça tîrî. Amac jê, bade ye.

Saqî tu were birrêne carek
Bo min bide (bi şertek mubarek)

Lewra ji fîraqê dîlkul im ez
Der rûz û şeban bi xulxul im ez

Dûr keftime ji yar û dildar
Yarı bi mîsalê hûrî nazdar

Umîdî wîssalê çû ji fîkrê
Ma hêviya weslê rojî heşrê

Qet nîne di fîkrê min xiyalek
Îlla ku hebîbik û şepalek

Zanim ku nebî tu destegîrim
Bin barê bela qewî esîr im

Saqî bide abî şubhê ateş
Zeyta dilê min tu pê bike geş

Min seh kirî ez tebîbê haziq:
Weqta ku nebit zeman muwafiq

Xeyrê qedeh û şerabê taze
Nadet ruxê dil nuquş û xaze.

Saqî were, lê xerab e halim
Min dil kul e, ez ji ber dinalim

Derman ke bi abî ateşînî
Derda birevîn ji vî hezînî

Saqî were ba mitrib û ba saz
Da bête dilê me keyf û perwaz

Saqî bi reqsê mitrib bibêje
Lewra ji xeman me eqil gêj e

Saqî qedehê tu deyne ser kef
.....nay û hem def

Serxweş me bikin bi bade û 'ûd
Da ez devê min bikşitin dûd

Hûn def'ê bikin ji min melalê
Da ba felekê bikim cîdalê

Dewra felek a muqîm û seyar
Qet nabe ji bo kesî re ew yar

Tu bes bike ey felek qelaşî
Hifza xwe bike, meger tu şas î

Daîm tu yî ey husûdê dujmin
Ba qismê beşer ji mîr eger jin

Nabî tu ji bo kesek re haval
Em cumle ji destê te xerabmal

Qet nabî tu ba kesek muwafîq
Îlla bi 'uşaqî re munafîq

Natırsî ji ahê aşiq ê zar?
Yek ahî bike te cemreyek nar

Ey sahibê hîle û xiyanet
Hifza xwe bike ji wan, emanet!

Herçî ku bibîne ew hebîbek
Îlla ku digel wî tu reqîbek

Xesma ku digel vî Xakiyê zar
Neyar û reqîb û zêde xedar

Sîne te li vî feqîrî kir çak
Xakî te kirî bi derdî xemnak

Xakî bese
Bispêre Xweda û eflak

Ev çendî dikî tu le 'bibazî
..... 'uzrê xwe bixwazî

'Uzrê xwe ji Rebê erd û esman
Daxwaz ke bo xeta û 'isyan

Lewra weku Xaliqê hemî xelq
Her ew bi tenê ye hakimê heq

Hukmê ew dide walî û wezîran
Rutbe dide hakim û emîran

Fa 'il ew e der umûrê muxtar
Ew xaliq e bo buhuşt û bo nar

Ger min bixî tu di narê nîran
Heqê min e, pur kirin me 'issyan

Wer min bikî daxilê buhuştê
Rehma te pir e, bi min ci xweş tê!

Ey xame bese e, bibirr xîttabê
Êdî were xetim ke Kitabê

Çendan tu bikî kelamê tettwîl
Axir ew e dê bikî tu tekmiîl

Qett' ke tu ji min nebînî tewbîx
Deyne tu ji bo Kîtabê tarîx.

Xame lerizî li ser serî çû
Gotî ku: Hezar û sêsed û du.

Yanî buhurîn ji weqtê Hîcret
Çêbû di wî weqtî ev hîkayet.

Tekmîlî bû ev kelamê mewzûn
..... bûyî Leyl û Mecnûn

Hem bo ruhê katibê Kîtabê
Da ew pê xelas bibe ji 'ezabê.

TEMMET

"Temam bû bi himetê te'ala ev nusxa kîtaba
Leyl û Mecnûn, li ser destê Muhemed Eskeriyê
kurê Şeyx Ebdurehman binu Şeyx Hesenê
Nûranî, li gundê Aqtepê. Wesselam. Temûz
1934."

FERHENGOK

Abad (f): Çêkirin û şenkirina xweş ji bo rûniştinê

Afitab, aftab (f): roj

Ahû (f): xezal

Aram (f): hêsa

Ateş (f): agir

Ayiş, ayişe (f): torr, perîşan, têkelbûyî

Aşufte (f): sewda

Aşunayî, aşina (f): dost, nêz, nas

Arî (e): tazî

Badî (e): çol, sehra

Bad (f): ba

Be'îd (e): dûr

Bednam (f): navxirab

Bedr (e): hîva dagirtî

Behâim (e): heywan .

- Bende:** kole, bindest, xulam
- Best :** girêdan
- Bezl :** rijandin, lêçûya zêde
- Bezm (f):** civat, kêfxweşî, mehfel
- Bîdar (f):** bêdar, hişyar, nerazayî
- Bidist, bedmest (f):** serxweşiya zêde ku ber bi şer diçe.
- Bîmar (f):** nexweş
- Birûn (f):** derve
- Bîsatt (e):** Tiştê raxistinê
- Bisota:** bişewitanda
- Brûdet (e):** serma
- Bulend (f):** bilind
- Butkede :** bitxane, Perestingeha seneman
- Bû, bo (f):**bihn,
- Cankudaz, cangudaz (f):** Tiştê ku rihê mirov bêzar dike.
- Cemaz (f):** deve, zûajotin
- Cemel (e):** huştur - deve
- Cennet (e):** bihişt, bostan
- Ceres (e):** zengil
- Cerhan (e):** birinan
- Cewarî (e):** qerwaş
- Cewz (f):** paqîjî, bişînbûn
- Ceylan (t):** xezal
- Cibal-an (e):** piraniya "cebel" e, çiya
- Cife (f):** laş, gewde, terrm
- Cimalan (e):** piraniya "cemel" e, deve
-
- Çaker :** evd, suxrevan
- Çak (f):** qels, şeqkirin
- Çapik, çapuk (f):** zû
- Çeşm (f):** çav
- Çirax (f):** çira
- Çun (f):** weke, (bo zeman jî tê gotin))

- Dad** : hawar, beramberî (edalet), feryad
Dah (f): Hawar, kinêzk
Darib (e): xwediye lêxistinê
Ddayî (e): wendakirin
Ddiya (e): ruhnî
Debir : tedbîrkar
Dehen (f): dev
Dehr (e): dem, sedsal, mûsîbet
Derûn (f): hinav, hindur
Dexdex (f): şewişandin, kederkişandin
Deyyan (e): qazî, dadmend, kesê hesab dipirse, (xeysetekî Xwedê)
Dîger (f): başqe, wekî din
Dîgergün (f): rengcuda, rengekî din
Dilaram (f): dilnazik
Dilara (f): qencmehbûb
Dilefrûz (f): dilxweşkirin
Dilruba : dilkêş, evîndar, mehbûb
Dirîxx, derixxa! (f): (derîxa) esef, hesret, haydar, emanet!
Dûd (f): dû
Dufûf (e) : piraniya "def" e, dahol
Durb, dirb : rê, kuçe, kolan
Durûd (f): silav, xwestin
Duxter (f): dot, keç-qîz
Dûz (f): terzî, dirûtin, bîrrîn, qurmîçandin
Duşnam (f): peyva bêrê, xeber
- Ebyat** (e): piraniya "beyt" e, dudêr, (setir) ji helbestekê.
Ecr (e): xêr
Edîyye (e): xwestin (du'a)
Efrûz (f): zêde
Efwac : fewc, qefle, qor
Efzûn (f): efsûn, efsane

- Ehcär** (e): piraniya "hecer" e, kevir
Ejdiya : ejderha, ziya, marê pir mezin
Elbise (e): (lîbas) cil, kinc
Elf (e): hezar (1000)
Elqisse (e): bikurtî, werhasil
Emwac (e): piraniya "mewc" e, pêl
Emwal (e): piraniya "mal" e, heyî
Engebin (f): hingiv
Enîn (e): ax, nalîn
Eqwam (e): piraniya "qewm" e, ehalî, eşîr
Erxewan (f): kulîka hinarê
Esma (e): ji "îsm" e, nav
Esmar (e): piraniya "semér" e, fêkî
Essbû (e): neynûk
